

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELĒN KURDISTANĒ LI SWEDĒ



10—85

BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris
Layout och sättning : Cotkar och Gundi.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet Rissneled
ed 55, NB
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.
/ år övriga 100 kr/ år
Postgiro: 643880-8

BERPIRSIYAR :

A. TIGRIS

REDAKSIYON:

BAVÊ NAZÊ
S. QEREC DAX
C. ŞERO
MUËYID TEYIB
BRÎNDAR
ADIL DURAN

PERGALA RÛPELAN:

COTKAR Û GUNDÎ

BERBANG

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona
Komelên Kurdistanê li Swêdê
Biha: 5 kronê swêdê
Abone: sal 50 kron

NAVNIŞAN

Berbang, Rissneleden 55 NB
172 44 Sundbyberg/ Sweden
Postgiro: 64 38 80-8

NAVEROK

bi dilsozekî kurdan re HEVPEYVÎNEK	C. Şero3
RAPORA XEBATÊ	Komîta Karger4
PÊKENÎN AN PÊGIRÎNEK	J. Rexnegir5
DILDAR Û HELBESTÎ CÛTYARAN	K. Mustefa Marûf6
PAŞA DÎN BÛ AN XELK	Hesenê Metê7
DÎYARIYA HERÎ MEZIN	Dêrxeydî8
JI PIRTÛKA " EM BIXWÎNIN RÛPELEK	9
DIHOK	Muêyed Teyib10
BARKIRINA KURDAN	Bareş Batê11
RONAHÎ JI NÛ VE ÇAP BÛ	11
polisê êşkencekar ÊŞKENCÊ ÊŞKERA KIR	A. Tigris12-13
BOMBE Û BELAVOK DIBARIN	14-15
ÇEND GOTIN LI SER ROMANA TU	Zinarê Xamo	16-17-18-19-10
DESTÊN TARÎ	Jêhat Diyar	
Fotografa rûpela yekem : Bilûrvanê Kurd Ehmed Fermanê Kîkî Fotografa rûpela duyem: Ji pirtûka "Em Bixwînin" rûpelek.		

bi dilsozekî kurdan re

HEVPEYVÎNEK

DESTPÊK:

Di diroka merovatiyê de, gelek cara merovan ji welatan koçkirine û çûnê welatên din. Di dema kevnarê de merovê xwunî û mêrkuj, ji warê xwe bardikirin û li warekî cîran bi çih dibûn. Merovê xwunî diket bextê malbateke xûnedan an jî dibû eşkiya û mahkum. Di vê dema diroka ya kevnor de burokrasiya peşve neçûbû. Pasaport, musaada kar û rûniştinê lihevhatina hukukî û hududê netewî pêknehatibû û danûstandinên merovan li gor şewrê dibû, ne nivisandibû. Bi pêkhatin û çebûna dewleta netewî ve, qanûn-norm û lihevhatina navnetewî, danûstandin çêbûn.

Qirnê 1900, bûye qirnê multeciyan. Bi میلیyanon merov bûnê multecî. Li Emerka latin, li Rojhilata navîn, li Asya, Afrika û Eorupa merov ji welatên xwe bardikin. Li gor gelek lêkofînan merov ji ber sebêben şiyasî, aborî, netewî, olî, ji welatê xwe bardikin. Ev merovana yan diçin wêlatakî cîran bi çih bûne, wekî felestînî, Efrîrî, Afganî, Iranî, li Emerka latîn, wekî El Salvador, Şîlî ûhw. Merov dikare bêje ku barê multeciyan pir biçûk li Ewropa bi çih bûye. Îro li cîhanê nêzîka 15 milyon multecî dijîn û ji wana hejmarekî gelek biçûk li Swêdîn.

MULTECÎ LI SWÊDÊ:

Di civata Swêd de gelek merov hene, ku bi multecî û bîyaniyan kar dikin. Merov hene tenê wekî kesê karmend nêzîkî karê multeciyan dibin, lê merov jî hene hin karmende û hin jî dost û hevalê multeciyan. Bi dilê xwe û xebata civatî her gav li gel multeciyan çih digre. Gelsên multeciyan ji van kesan re ne fobbi ye. Li Swêdê gelek merovê wusa tune ne, ewê, ku hene jî zêde nayên naskirin. Yek ji wan karmendan Lors Gunnar Eriksson'e. Lars-Gunnar jî hêla gelek hevalê kurd û xwendavanên Berbangê we naye naskirin. Di gelek kongrên Federasyonê de di pirtûka ku Învandrarverket (Daira Bîyaniyana Dewletê) li ser kurdan derxist (Om Kurder) di pirtûka agahdari li ser multeciyan (Att ta mot fluktingar) û di kovara

c. Şero

invandrarverket (Ny Sverige), pir kesa navê Lars-Gunnar bihistiye. Semînera ku li ser kurda, ji hêla invandrarverket hatibû. Lê di sa ji gelek kesê kurd yen ku li Swêdê dijîn Lars-Gunnar baş nasnakin.

Ji zû ve min dixwest ez bi Lars-Gunnar're hevpeyvîneke bikim. Lê belê pir cara planê me kete avê. Cara dawî me hevdu di 10.01.1986 de li Stockholmê dît. Min ji Lars-Gunnar pirs kir: Tu dikarî hinek bahsa xebata xwe ya derbasbûyî bikî û li ser jiyana xwe hinek agahdarî bidî me? —Ez niha wekê Redaktor, li daîra Agahdarî di Invandrarverket de kardikim. Daîra me, berpirsiyara hemû xebata agahdarî li Invandrarverkete. Beriya ku ez bê me Invandrarverket min li rexistmeke multeciyan ku xebata navnetewî dike, kardikir. Di navbena 1965-1968 ande ez weke karmend dixebitiam, di 1968-1980 an de ez bûm chef (serekê) IUEF (Internationell Universite Exehong Found). IUEF rexistneke merovanî bû û ji hêla welatên skandinavi û Ewropayî dihatê fînansekirin. Bi teybetî IUEF afkariya multeciya Afrîka û Amerîka latin di kir. Piştgirtiya projên li hember piçûbûnî fêrbûna xwedîn û nivisandinê dikir. Ji aliyekî din ve jî me afkariya tevgerên rizgarîxwazên Afrîka Bakûr dikir. Di dîtinên fînanseke me de, xebata me gelek radikal bû ji alikive jî gelsên me yê personell hebûn. IUEF di 1980 î de nema xebatkir. Ez di 1982 de hatim. Invandrarverket û li daîra Informasyon (agahdarî) min dest bi xebatê kir.

Lars Gunnar xebata afkariya multeciyan ji wexteke kevin de destpê kiriye. Gelek rewşa multeciyan baş dizane. Li Afrîka û Amerîka Latin bi salan li nav multeciyan maye. Gava merov



LARS GUNNAR ERIKSSON

munaqasha problemên multeciya dike. Merov mesala pirtî canan dike çaliban. Me ji Lars-Gunnar pirs kir; Çi ferk di navbena rewşa multeciyan 1960 û 1980 i de heyê? Merov dikare hinek bingeheş esasî bijmêre, wekê, şiyasî û aborî ûhw. Awira gelemperî (Efkare umumî) li Ewropa çawa ye?

—Di navbena rewşa multeciyan 60 û multeciyan 80 yî de, gelek ferk hene. Di 60 de zêde agahdarî li ser multeciyan tune bû, cîhana sîsêya gelek ne dihatê naskirin. Zaniyarî li ser rewşa multeciyan, heq û hukûkên multeciyan, problemên Amintî (guvenlik) pir çels bû. Di 60î de hejmara multeciyan gelek hindik bû, îro hejmar zêde mezin bû ye. Li cîhanê nêzîka 15-20 milyon multecî dijîn. Problemên multeciyan jî koloniyên portekîz dihatin, Efrîkaniya bardikir. Lê îro jî Rojhilata Navin hejmareke mezin. Li Awropa multecî hene, pir kes jî, ji Emerka latîn hene. Rewşa multeciyan bûye problemeke cîhanî, rewşek merovati kirina şiyasî, dewletên mezin (Superdewlet) di nav meselên dinê. Ji ber vê yekê mesela multeciyan pir tevliheve. Ewropayî jî (gelê ewropayî) li vê yekê gelek ditirsîn û biyaniyê dimînim. Li Swêdê 1984. (4.600) multeciyan musaada rûniştinê girtin. Piranî jî, ji derweyî Ewropa bûn. Wexta ku Polonî têne Swêd û welatê din yê Ewropa, kes zêde bahsa wan nake, lê ku multeciyan li derweyî Ewropa hinek zêde dibe, rojname û Radio-TV bahda multeciyan bi başî nakin. Li himberê multeciyan Ewropa Şerqî (Rohilat) Swêdî bêtir pozîtîv in, ji ber ku ji alî çandî de ferqên mezin tune ne. Lê bête jî Libnaniyan Swêdî ditirsîn. Libnan duri Swêdê û çanda me nasîbê hev uhw. Di serê gelê Swêdî ev pirsîyana her gav aktuel e.

Dûmahik rûpel 21

RAPORA XEBATÊ

GELÎ NÛNER, ENDAM Û XWENDEVANÊN HÊJA! KOMÎTA ME, KOMÎTA KARGERA FEDERASYONA KOMELÊN KURDÎSTANÊ LI SWÊDÊ, DI PEY KOMCÎ-VÎNA XWE YA AWERTE DE CÎVÎYA, PLAN Û PROGRAM 8 MEHAN DA PEŞÎYA XWE. DI VAN HEŞT MEHÊN BORÎ DE, EW KARUBARÊN KU ME PÊK ANÎ; EM DÊ LI JÊR BI KURTÎ Û XAL BI XAL PÊŞ-KÊŞÎ WE BIKIN!

- * Di civîna yekem de komîta karger karû bar di nav xwe de belav kir.
- * Ji bo peyda kirina lokalê bi ABF re têkilî hatin danîn.
- * Biryar hat girtin ku makîna nivîsê ya Federasyonê dê ji komelên endam û kesên nîştimanperwer re bête kirêkirin. Û ev biryar bi cî hat.
- * Ji bo Newroza 1986 an karûbarên lokal girtinê hat domandin.
- * Ji bo radyoke kurdîya lokalî muracat hat kirin, lê ji ber ku Federasyon rêxistineke navendî bû, komîta radyoyê muracata me qebûl ne kir.
- * Ji bo Redaksiyona Berbangê danûstandin hatin danîn û redaksiyon pêk hat.
- * Me, encama komcivîna awerte bi namek sazgeha biyanîyan re dazandin û wan jê agahdar kir.
- * Ji bo meşandina karûbarên 12 ê Îlonê, ji komîta karger du hevalan berpirsiyarê girtin ser xwe û wê karûbarî meşandin.
- * Ji bo 12 ê Îlonê Federasyonê bi komelên endam re civîn çêkir û ji bo xebatê biryaran girt.
- * Mal û eşyayên Federasyon yê ku li der bûn hat tespît kirin.
- * Ji bo protestokirina 12 ê Îlonê li Medborgarhuset şevêk pêk hat.
- * Li Spanga, bi komela jinan re şahiyek pêk hat.
- * Li ser hîlbijartina giştîya Swêdê bi partiyên Swêdî yê siyasî re têkilî hat danîn û bi nûnerên wan re li Tensta Träff civînek pêk hat.
- * Biryar hat danîn ku li ser navê Berbangê, şeveke çandî çêbe. Û ev şev wek şeveke çandî û şeva zarokan, piştî serê salê pêk hat. Di nav zarokên kurd de warê helbest, çîrok û wênan de musabeqek çêbû.
- * Li ser hinek daxwaz û pêşniyarî, di derbarê kurdên Lubnanê de namek ji wezaretê biyanî ji hinek meqamên swêdî re hat şandin.
- * Li ser rewşa kurdan bi rojname û rojnamevanên swêdî re têkilî hatin danîn.
- * Ji bo temînkirina lokalê bi berpirsiyarên belediya Stockholm re pêwendî çêbûn. Ji Komîsyona belediyan hevalek vî xebatê girt ser milê xwe.
- * Têkiliyên komîta me bi her awayî bi Komîsyona Bele-

dîyan re berdewam kir. Me bi hev re muracatê projek kir. Dafa biyanîyan ji bo vî proja ha, ji me re 20.000 kron alîkarî da.

- * Hevalek ji komîta karger beşdarê civîna Landstingetê bû.
- * Bi alîkariya ABF a Stockholmê, ji bo dagerandina kome-lan kursek hebû.
- * Ji bo bîranîna Yılmaz Güney namek ji rojname, radyo û televizyona swêd re hat şandin û Federasyonê, li Tensta Träff şeva bîranîna wî pêk anî.
- * Di derbarê multeciyên kurd de Federasyonê, ji meqamên swêdî re namek birê kir û bi hinek berpirsiyaran re têkilî danî.
- * Ji bo bîranîna Seydayê Cigerxwîn Federasyonê li gor xwe xebat kir û hevalek ji komîta karger di civînê de li ser navê Federasyonê axaftinek kir.
- * Ji bo derxistina bultenek — bi swêdî — biryar hat dayîn û hejmara yekemîn di meha sibatê de derket û ji civînan fermî re hatin şandin.
- * Li ser bûyera Medborgarhuset bi swêdî namek hat hazir-kirin û bi radyo, tv û rojnamevanan re presskonferanse hat çêkirin.
- * Li ser mirina Prof. Qanatê Kurdo, ji malbata wî re telgi-rafeke serxweşîyê hat şandin. Û Federasyonê 40 rojîya Prof. Qanatê Kurdo bi bîranî.

- * Ji bo kongrên komelên endam û yê biyanîyan name-yên serketin û serfiraziyê hatin şandin.
- * Ala kurdî û rozet hatin çêkirin û belavkirin.
- * Ji bo nasandina rewşa kurdan, komîte amade bû û ev komîte bi partiyên swêdî re têkilî danîn. Komîtê, civîna pêşîn bi Hans Göran Frank re çêkir.
- * Ji bo tije kirina kasetê Kikî — bi swêdî — wek proje mura-cat hat kirin.
- * Me di 8 mehan de, 8 hejmar Berbang derxist û bi ser û ber belav kir..
- * Li ser edebiyat û zîmanê kurdî, redaksiyonê, bi nivîskar û hunermendên kurd re civînek çêkir û panelek pêk anî.
- * Bi komîta nûneran re 4 civîn hat çêkirin.
- * Komîta Karger her hefte civîya.
- * Ji komelên endam re wek her civînê, ji bo kongrê jî name hat şandin
- * Hevalek ji komîta çavdêr, beşdarê kursa aborî û kont-rolkirina defteran bû.
- * Hevalek ji komîta karger, li ser navê Berbangê beşdarê kursa pergala (mîzampajê) bû.
- * Ji bo Newrozê cî hat dîtin û komîta karûbarê Newrozê pêk hat.
- * Komîta me, hazirîya kongrê kir û ji bo beşdarbûne ji rê-xistinên biyanî re namek şand.



PÊKENÎN AN PÊGIRÎNEK



Ev bûyereki rast e. Mîn vê bûyera ha ji çend hevalan dîhist; gelek bala mîn kişand û min xwest, ez wê di nav rûpelen Berbangê de jî biweşînim!

Rojek ji rojan, riya kurdekî welatparêz bi bajarê Stembolê dikeve. Ew cara yekem e, ku tê Stembolê. Herweha gelek dost û nasên wî, li bajarê Stembolê hene. Ew dixwaze hemûyan bibîne û kêfxweşiya wan pirs bike. Dibe ku careke din ne be qismet û nikaribe were Stembolê. Ji ber vê yekê jî, hemû divayiyên xwe pêk tîne, ku dost û nasên xwe bibîne

Kurdê me yê welatparêz, di nav çend rojan de digihîşe armanca xwe; piraniya nas û dostên xwe dibîne. Evcar dor naye ser vexwendina wî û mêvaniyê! Ew kes û malbatên ku bi hatina wî ya Stembolê dihesin, dixwazin wî vexwînin mala xwe. Her hembajari û nasê wî, wî bi tax tax û herem herem heta kolan bi kolan digerin. Bajarê Stembolê şanî wî didin. Her kes di dema gerê de mêvanê xwe yê giranbiha bi kurdên din dide nasandin. Û herweha bi rojan mêvaniya wî dom dike. Çendek paşê ew dixwaze vegere mala xwe, here Kurdistanê. Lê dawiya nas û dostan naye. Derdê serê derdan hin nas û dostên din jî çêdibin!. Di rediyê kîjan dikani de diçin hundir, dinêrin kurd e.

Gaziyê kîjan barkêş dikin, kurd derdikeve. Li ber deriyê kîjan xaniyê bilind radiwestin, dibînin ku dergevan jî bi xwe kurd e. Di ha kîjan inşat de derbas dibin, dibînsin ku xebatkar bi kurdî dipeyivin. Ji xwediyê kîjan erebe fikî û zerzewat dikrin û di dema pazar û peredayînê de tê digihin ku fikîfiroş jî kurd in.....

Welatparêzê me, matmayî dimîne. Xwe ranagre û ji hevalê xwe dipirse: — Ma kuro ev Stembolî tev kurd in, çi ne?

Hevalê wî bi ken weha bersiva wî dide:

— Na keko ji bo ku em kurd in, em diçin ba kurdan. Lê kurd li Stembolê gelek in.

Welatparêzê me, di ciyê xwe de radiweste û pirseke din ji hevalê xwe dipirse:

— Tu dibêji gelo çi qas kurd li Stembolê dijîn?

— Li gor texmînan ji nîv milyoni bêtir kurd li Stembolê dijîn.

Welatparêzê serê xwe kire ber xwe û bîstekî bê deng dimîne. Paşê ji cigera xwe ve axîneke kûr dikşîne. Tûk dike erdê. Mûrê wî tal û tîrş dibe û bê deng dimîne. Hevalê wî dikene û lê awir dide

— Çi bû dişa, tu weha xwe diqehrîni û keseran dikşîni?

Ma bira ez ne qehrim, kî biqahre! Ma nîv milyon kes hindik in? Wek

j. rexnegir

dibêjin li Ewropa ji nîv milyoni kêm-tir çend dewlet hene. Yê me li bajarê Stembolê tenê nîv milyoni kurd hene. Û tû tişt jî nakin. Devên xwe dirûtine û dest û lingên xwe jî girêdane! Bes li kar û peran digerin. Xaniyan dikirin....

Yê din baş bala xwe da pê û li nav çavên wî mêze dikir. Li bal û çiqrên enî û rûyê wî de baş derdixistin ku ew çi difikire û dê çi bêje. Ji ber ku li Kurdistanê bi salan bi hev re mabûn. Bi hev re xebat kiribûn! Her du hevalan bi hev re gelek rojên kêf û xweşî-reş û tarî ditibûn.... Ta hevalên hev ên zarokiyê bûn.

Piştî van peyv û galagan, her du jî bê deng di kêleka hev re dimeşyan. Ber û berê rê, ber bi qeraxê deryayê ve dimeşyan. Ji galegal û remanan xwe ji bir kiribûn. Otomobîlek li pey wan bi dengê bilin û zîz li klaksiyona xwe xist. Her du ji nişkave bilind firin û bi tîrs xwe avêtin qeraxê rê. Şofer bi hêrs û bi dengê bilind:

— Ulan çavên we kor in, wira gund nîn e, hun di nav rê de dimeşin!

Hevalê wî ketibû milê wî bi nîv he-nek:

— Te dît kerbabê şofer hindik mabû me bike binê erebê! Û hemû sûcê te bû; ez nizanîm tu ji me kur-

Dûmahik rûpel 22

DILDAR Û HELBESTÛ CÛTYARAN

Dildar le şîyekan da wekû helbestvanekî niştîmanperwer û şoreşgêr hewlî huşyar kirdnewey lawan û xelkî Kurdistanî dawê palî pêwe nawn bo xebat û têkoşan le pênavî hênane kayey rijêmekî dimukrasî gelî; belam le şîrî (tutenewan) û (lalebas) da berew xebatî çinayetî hengaw denê û wekû şarekî tir xoy nişan dedat şairî cûtyaran, şairî zorbey zor gel meseley netewayetî be meseley cûtyaran dezanê.

Stalîn wetanî bizutnewey niştîmanî le nawerok da bizutnewey cûtyaran e. Hoy em aso rûnyeştî degerê bo ewey şarî deçête rêzî partêkî komonîstewe debete xawenî ideolojîyekî diyarî kiraw le boçunekanî ke ideolojîyeyî cûtyar û kirikaran e. Lew rwangewe derwanete meseleke ke delê hiç bizutneweyê serkewtû nabêt. Eger xebatî netewayetî û çinayetî pêkewe awête nekat û lem pêwdangewe hengaw nenê.

Helbestvan zor şarezayane, le çinekanî naw komel geys-tiwe, boye hatuwe basî çinêk dekat ke le % 80 î komelî kurdewarî lê pêk dê hewlî derxistinî çewsandinewey çinêkî serekî komelî dawê bo bergirî kirdin; le mafî reway xoyan ke Mao Tse Tung be hêzî serekî şorişî dezanê. Her weku markîsî- lînî derî xistuwe ke em çine debê. Piştî pê bibestrê le katî xebat da, çunke zorbey here zorî gel lawan pêk dêt û xawenî hiçî xoyanin û renc deden û berhemî renc û areçyan le layen derebegewe demijrê, le şîrekanî şair em rastiye be rûnî xirawete rû ke çon ladêyî Kurdistan hewl û koşîş deden. Derebeg û axa û kêxwa û daru deste kayan de nûkî tifeng lê yan zewt deken bê beşyan deken. Le mafî reway xoyan le encamî em kareş da çî core jîyanekî naxoş û pir le kulemergî û nahemwarî jîyan debene ser û çî core talawêk deçêjin le sayey rijêmî derebegî xuwên mijewe boye le şîrî (lalebas) da delê:

Ewa çil sale zewî dekêlim
Fellahî dekem hetakû îmro
Nîrxî areçey rûnî mandîyim
Tike nanê ke çî nan nane co
Ewîş be bê do (1)

Şairî dîmenî duwakewtûyî ladêyî Kurdistan û çewsandinewey mirov le layen mirovewe dexate rû ke çon cûtkar le rûy şarîstaniyeyewey duwakewtûn ke çî axa û derebeg le koşku xanûyî pir le keresey pêwîst jîyan debene ser bo nînûne le şairî (tutenewan) da delê:

Naw malî awdêr herzale pê çûk
Dû parçe berî şîr û helziraw
Cereyêkî kon sê gozey kexîw
Çend hamanî reş camekî qupaw (2)

Şairî (helbestvan) dest nîşanî şîtêkî giringî kirduwe le jîyanî ladêda, ewîş nexoşî û derdedariye ke çon tengî pê helgirtûn le (tutenewan) da delê:

Afretêk lewla lal û pal kewtû
Bê hoş le ber ta le birsa jakaw
Mîndalêkî ler cumir şeş salan

k. mustefa marûf

Le pê û rû kewtû be mil peşokaw (3)

Rûyekî tirî çewsandinewey cûtyaran bêganî û suxire pê kirdine, le layen derebegewe bo em wêneyeş le şîrî (lalebas) da em rastiye debînrê ke axa çon legel cûtyaran mamele dekat çî rastew xo çî le layen çil kawxorekaniyewe bêt.

Wutî le hawîn kwêxa kake sûr
Hete malewe pêy wutim lalo
Şayedî bide zewî zêrîn dol
Ke wa hî mine quranîş bixo (4)

Herweha le wulate du wakewtû û nîmçe derebegekane da mirî piştgirî, axa û xawenî mulkdar dekat dij be çinî çew-sawe, lem rûwewe Lînî delê : " Damudezgakanî dewlet her le seretay dirust bûniyewe le gêtî da damudestgayek buwe bo xizmet kirdinî berjewendî çinî deselatda û hawpeymanekanî hatote kayewe" Dildar le (Lalebas) da delê:

Le koye çûme lay zabît wutim
Efendî umrim geye hefto û no
Bêcege lem kure wecaxim kuwêre
Bemînî bibexşe memke rencero
Zabît turebû helsaye se pê
Firêy dame der be pale pesto (5)

Beşekî tir le hawpeymanekanî derebeg le Kurdistan da mela koneperîstakane ke piştgirî le bûnî axa deken û rast be diro dexor bo ewey axa padaştîyan bidate û le axa nîzik bîbnewe. Le Şîrî (Tutenewan) da em rastiye be der dekewê.

Mela defterî ser û jêr dekird
Ewla milkeçû muntezir damaw
Kêxwa simêlî mişt û mal dekird
Mîniş bîr le ser ewlay mal rimaw (6)

Lem dû şîre da, wate şîrî (Tutenewan û Lalebas) da Şairî berew rîyalîzmî rexine girane hengaw denê, wêney rîyalîzmî rexine giraney têda debînrê. Ca ba bizanî rîyalîzmî rexine girane çî degeyenê? Rîyalîzmî rexine girî ewey ke şair, waçîe nalebareke dexate rû legel rexine lê girtinî be hîway çare ser kirdinî. Dildarîş em şitanî peyrew kirduwe le (Tutenewan û Lalebas) da. Çend xalî serrekî lem dû şîre da debînrê:

1— Demeteçeyekî rexine giraneye le nêwan dû çinî komel, çinî derebegî û çinî cûtyar.

2 — Şair be Şeweyekî rastgo em rastiye weku xoy de xate rû.

3 — Huşiyariyan de katewe le kem û kurîyekaniyan ke emeş le xoy da çare serê ke bo meseleke.

Hesené Meté

PAŞA DÎN BÛ AN XELK

Di heyamên berê de bajarekî mezin, şên û gelekî xweş di navçeyê de ava bû bû. Paşê bajêr, paşekî pir dewlemend û hal xêş bû. Bi xelkê xwe re jî, zaf dilxweş bû. Heger paşê bigota yek, kesekî ne dikir dudu; di cî de gotina paşê pêk dahat. Ji ber vê yekê jî, paşa her dem pesnê xelkê xwe dida, bi wan xwe mezin dikir. Ji hêla din ve, paşê bi xwe jî, li xelkê xwe guhdarî dikir. Daxwaza wan bi cî danî. Yê n birçî têr dikir, yê n tazî bi kinc dikir û yê n ku nikarî bûya jin baniya jî, bi mal dikir. Herweha paşa bi xelkê û xelk jî, bi paşê çayîl bû. Bi hev du re jiyaneke xweş, bê gilî û gazin diborandin.

Dîwana paşê her tim jî xelkê tije bû. Paşê salê du caran di dîwana xwe de, xelkê xwe diezbandin û dida berhev- kirin. Hemî şêx, mîr û mezinên wekî din jî, dihatin van civînan. Di van civînan de, remildarê paşê jî her hebû û ji bo ku xêr an şerê li pêşiya bajêr bizaniya be, remla xwe davêt.

Di salek sala wusa de, dîsa dîwana paşê li hev geriya bû. Bi her babetî meriv, jî ehlên bajêr hati bû dîwanê. Paşa ban remildarê xwe jî kir. Remildar ber bi paşê hat û silav li paşê û civata dorê kir; dîre çû ciyê kiramatê rûnişt. Piştî ku paşê gotinên xwe bi civatê re qedand fitilî ser remildarê xwe û got:

— Remildarê hêja, vê carê dora te ye! Ka bêje çî li pêşiya me heye? Divê tu tiştêkî jî me veneşêrî! Çî di remla te de derkeve jî me re bêje!

Remildar hinek av û cilikek xwest. Xulaman zû-zûka çûn anîn. Remildar destê xwe şil kir, di ser çavên xwe de da. Remla xwe kişand ber xwe, cilik kişand ser serê xwe û wilo ma. Yê n din di dîwanê de, deng jî wan biliya. Deng jî kesekî ne dihat. Çavên hemiyan li remildar bû û bê tebat li wî temaşe dikirin. Piştî demeke dirêj, remildar cilik bi hêr jî ser xwe avêt û axinekî kîr veda. Paşê bi tirs berê xwe da remildar û jê pirsî:

— Ya remildarê delal, de ka were! Xwedê bi ya xêr bike, çima te weha keserek berda?

— Ma çî xêr e ya paşayê min; na bi navê xwedê tiştê ku min dîtiye,

ne xêr e. Ya paşayê min yê delal, divê tu bizanî, ku xezebek mezin li pêşiya bajêrê me ye. Li gor remlê di dawiya vê payzê de, dê ba û bahozek rabe û dê sê roj û sê şevan bidomîne. Di pey bahozê re jî, dê baraneke xurt, şev û rojek bibare. Lê ya xerab ev e, ku kesê jî ava vê baranê vexwe dê dîn bike.

Dema ku remildar gotinên xwe qedand, hemî kesên di dîwanê de bi nê-hirînek bêhêvî berên xwe bi paşê ve kirin û mat man. Paşa hustuxwar, serê xwe berda bû ber xwe. Dîwan li benda gotina paşê bû. Paşa serê xwe rakir û jî civata dora xwe re got:

— Gelî civatê! We hemiyan bîhîst ku remildar got çî. Tiştê ku ez karibim bikin ev e, em ehlê bajêr haydar bikin jî niha ve hazirîya ava xwe ya payzê bikin; sarinc, kaf û firaçên xwe tije av bikin.

Civatê bi tevayî ev gotinên paşê rast dîtin û gotin "ya baş jî ev e." Sibê zû ev nûça ha di nav bajêr de belav bû. Lê paşa û wezîr tenê debara ava payzê kir in. Di hewşên xwe de çalên avê kolan û wan tije av kirin. Lê jî xelkê tû yekê jî van gotinan bawer ne kiri bû û debara avê jî ne dikirin. Bi ken û tinaz jî hev re digotin:

— Ev çî ye lo! Ki dê çalê di hundirê hewşa xwe de bikile û tijî av bike. Wî remildarê virek, dîsa vîran dike. Par jî gotî bû "bila kes sê rojan jî hundir dernekeve, dê erd biheze" û em sê rojan tî û birçî di hundirê xarî de man. Guh medin wî beredayî remend.

Rojeke jî rojên dawiya payzê ehlên bajêr dîtin ku jî dîr ve babelîsk-kek rabûye û ber bi bajêr tê. Babelîsk her ku dihat mezin dibû, heya bû bû bahoz. Bajar di nav tefîl-dûmanê de wenda bû. Ehlên bajêr jî tirs ketin hundir, jî ber ku xwe jî vê xezeba xwedê biparêzin. Sê roj û sê şevan tû kesek jî mala xwe derneket. Piştî sê roj û sê şevan bahoz derbas bû. Lê, baranek xurt jî jor û jêr de li ser bajêr bariya. Li ber vê xezebê dê li zarokên xwe xwedî dernediket. Her kesî li xelasiya serê xwe digeriya. Bajar di bin avê de mabû. Piştî şev û rojekê, tavek mîna tavên buharê

derket.

Ev bû bû çar roj ku ehlên bajêr jî hundirê xwe derneketi bûn. Dikirin ku hemû jî tînan bifetisin. Rahîştin firaçên xwe da ku jî çafik û çalikên der ve yê n bajêr tijî av bikin û bîmin malê. Dewar û pezên xwe jî birin ser çem û newalan av dan. Bes paşa û wezîr hêj di hundir de bûn. Roja pêşîn bi bîdendî derbas bû. Lê ava baranê di roja duduyan de tesîr li ehlên bajêr kiri bû. Dengê keti bû nav bajêr, dengêkî tev li hev. Paşa û wezîr di hundirê mala xwe de gelekî fikirîn da ku bizanibin, ev deng jî ber çî ye. Ji wan werê ku dijmin girtiye ser bajêr. Bi tirs rext û postên xwe girêdan. Derketin nav bajêr. Nêhêrîn ku çî bibînin, jî zarokan heta kal û pûrên bajêr dilîzin, lotika didin xwe; jin û mîr li ber çavên her kesî bazdidin ser hev. Ji fediya paşa û wezîr xwe didin tal- dên xaniyan û jî wir temaşa ehlên xwe dikir. Divê navberê de çavên çend xortan li paşê û wezîr ketin. Bi dizî bi aliyê wan de çûn. Xortek jî wan xwe jî nîşkave xwe avêt ser paşê taca serê wî revand. Paşa bi qaçalê paşatiyê bera ser piştî xort dida. Paşa nedigihya xort. Xort jî carna di- sekiniya heta ku paşa nêzikayiyê lê bike û dîre dîsa bi gavên fîreh bazdi- da. Bi vî hawayî çend cara domand. Ehlên bajêr hemû bi deng bi vî rewşê dikeniya. Dawiya dawî paşê nêhêrî ku çare têd de tune ye loma dev jê jî taca xwe berda û çû mala xwe.

Bi qasî çend rojan, paşa û wezîr di hundirê xwe de man. Gelekî jî difiki- rîyan. Lê çenedibû. Diviya bû jî wir bar bikira, na yan wan jî ava baranê vebixwarana. Barkirin bi paşê zor da- hat. Wî gelekî jî ehlên xwe û jî bajare xwe hez dikir. Dilê wî çayîl ne dibû, ku bajar û ehlên xwe di cî de bihê le. Paşê bana wezîrê xwe kir û pê şewi- n!

— Ya wezîrê min yê delal! Her wekî ku tu jî dibînî, ehlên bajêr bi tevayî dîn bûne. Bi vî rewşa me, bi wan re û di nav vî bajarî de jiyîn bêkes e. Ez du rîya têde dibînim: Barkirina jî vî bajarî, yan jî, vexwarina ava baranê... Îcar ez dibêjim, vexwarina ava baranê, jî barkirîne çêtir e. De ka tu çî dibêjî?

Wezîr bi livek bêçare:

— Paşayê min, ez jî te ne çêtir im. Heger ku tu jî wek xelkê jî vê avê vexwî, ez dê jî vexwim.

Paşa, wezîr zar û zêçên xwe li hev civandin û çûn jî ava baranê vexwarin..

DIYARIYA HERÎ MEZIN

Dêrxeydî

KOLEKTÎVÎ — PISPORÎ Û ZANISTÎ

Îroj her netewe û sazgehên pêşketî û nûjen, ji bo avakirin û bi destxistina efrandinên hêja û giranbiha, li ser van sê xalên giring radiwestin:

KOLEKTÎVÎ — PISPORÎ Û ZANISTÎ.

Di warê her cûrê xebatê de, ev her sê xalên taybetî hev temam dikin. Çewtî û kêmasiyên xebatê bêtir kêm û hindiktîr dikin. Ji van sedem û encaman, di dema me de di warê xebata rewşenbirî û zanyarî de giringî didin ser xebata kolektîvîya pisporî. Di şûna xebata bi xweser û tenê de, giringî didin xebata grûbî û kolektîvî.

Bi taybetî xebateke wisa zanistî, pisporî û kolektîvî ji me kurdan re hîn pêwîst e. Ji ber ku ji sed salan, heta ji hezar salan vir ve dewlet û hêzên mêtîngehkar, ziman, wêje û çanda me qedexa kirine. Ji ber vê yekê jî, zimanê me yê nivîsê yê navendî û yekgirtî pêk ne hatiye. Heta îroj ew kesên ku destê wan pênuş girtine û nivîsandine, her yek li gor devok û zaravayê xwe bêjeyên kurdî rêzkirine. Ev rewşa rengîn û bê ser û bê pergal îroj jî, rojane ye. Her kesekî pênuşgir, devok û zaravayê xwe, bastir û xweştir dibîne û diparêze. Her pênuşgirekî kurdî, xwe dike stûna zimanzanîne û devoka xwe jî dike serçaviya akademiya zimanê kurdî. Û ew kesên xwendevan yên ku weşanên kurdî dinitrînin û dixwazin zimanê nivîsê fêr bibin, di vî qerembole û tevliheviyê de xînt û şaş dibin. Nizanin çawa bikin û çi bixwînin.!

RASTÎ DI XEBATA KOLEKTÎV DE YE

Riya ji vê alûz û hezazê derketin, bê guman di xebateke zanistî, nûjen, pisporî û kolektîv de derbas dibe. Her kes hêz û zanîna xwe tîne ba hev û perspektîveke dûr û kûr pêk tê. Wek deryaya ku ji dilop û çeman çêdibe. Zanîn, hunermendî û hêçandinên her kesî, berheme hîn dewlementir dike. Bi dîtin û zanînbûna min, merov kare bêje ku cara yekem e, kurd ev her sê xalên giring û taybetî tînin ba hev û bi kar tînin. Ev karê hêja û giranbiha di pirtûka "Em bixwînin" de xwe dide dîyar kirin. Bê şik, di pirtûka "Em Bixwînin" de jî hinek kêmasî û çewtî hene. Lê ne wek yên din e. Pirtûka "Em Bixwînin" — pirtûk alfaba kurdî ye. — ji aliyên sê grûp û hinek kesên zana û kêrhatî ve hatiye nivîsandin, wênekîşandin û çapkirin. Wek gruba mamostan, pedegogan û zimanzanan... Hemû kes û gruba, ji her alî ve zanîn, hêçandin û hunermendiyên xwe heta ku destên wan hatiye kirine yek. Ji ber vê yekê jî, ez karim bibêjim, ku pirtûka "Em Bixwînin" ji hêla metod, pedagojî, wêne û ziman de ew pirtûk û alfabeyên kurdî yên ku heta niha derketine di nav wan de ya herî baş û qenc e. Ev jî ji xebata kolektîvî tê.

SÊ BEŞÊN CÛRBE CÛR

Pirtûk ji sê beşan pêk tê. Beşa yekemîn li gor hinek hevokên pirtûkê hinek wêne hene. Ev wêne li gor nave-rok û bergehên hevokan in. Ji bo balazarokên şagîr bêt kêşandin ev beş hatiye çêkirin. Beşa duyemîn, ji tîpa "A" heta tîpa "Z" alfaba kurdî des pê dike. Û ji bo her tîpî bê wêne mînak hatine dayîn. Beşa sêyemîn, nivîsar in. Nivîsar li gor babet û demsalan hatine nivîsandin. Ev nivîsar li gor psîkolojiya zarokan hatine hilbijartin. Dîsa li gor metoda pedagojîk gelek sivik in. Piraniya wan babetên nivîsaran di dema fêrkirina alfabê de berê hatine bi karanîn. Giranî li ser fabil, helbest û lihevhatiyên sivik û hêsa ne.

DU METODÊN ZANISTÎ BI HEV RE

Di pirtûkê de du metodên perwerde û hindekariyê yên herî hêja bi hev re hatine bikaranîn û hunandin. Metoda analîz û sentez. Ji tîpa "A" heta tîpa "Z", ev herdu metod bi hev re hatine bikaranîn. Berê hevok tevî dest pê dike û paşê hêdî hêdî ber bi bêje, kîte û ber bi tîpê tê. Û metoda din jî bi tîpê destpêdike. Ji bo her tîpê, bi wêneyên berçav çend bêje, mînak hatine dayîn. Û Herweha her du metodên zanyariyê û nûjen bi hev ve hatine hunandin. Hev temamdikin.

DI PIRTUKÊ DE MERCÊN JIYANA SWÊDÊ

Divê neye ji bîrkin ku pirtûka "Em Bixwînin" bi alîkarî û inşiyatîva Enstîtuda dewletê ya jêbo agahdariya navigînên hînkirîne ya Swêdê amade û çap bûye. Yanî Dewleta Swêdê ji bo zarokên kurd yên ku li Swêdê dijîn û li wêr diçin dibistanan amade kiriye û belav kiriye. Nivîskarên pirtûkê mercên jiyana Swêd û zarokên kurdên li Swêdê jî girtine ber çav. Nivîskar ê wênekêşê pirtûkê jîyan û taybetiya Kurdistanê û Swêdê anîne ba hev û bi hev ve hunan e.

DIYARIYA HERÎ HÊJA

Pirtûka "Em Bixwînin" ji bo sinifa yekemîn û duyemîn hatiye amade kirin. Lê ji bi kesên mezin yên ku xwendin û nivîsandinê nizanin jî efrandin û serçaviyeke gelek hêja ye. Û meriv kare wê pirtûka ha ji kurdekî tirk, kurdekî niv faris û ji kurdekî çaryek ereb re diyarî bike. Bi yamin, dê ev diyariya herî mezin be!

Ez, ji pirtûkê rûpela "A" li kêlekê berpêşî xwe xwendevan dikim.



RÛPELEK JI PIRTÛKA " EM BIXWÎNIN"

Azad diçe dibistanê.

Azad diçe dibistanê.

A zad di çe di bis ta nê.





- AX! WELATÊ MIN Ê LI JÊR PUSTALÊN DAGÏRKERA RIZÎÎ..
BÊHNA TE ÇENDA XOŞE !!!

MUËYED TEYİB
STOCKHOLM ... 1985

D'bê jin..
Tu yê bûye bajêrekê mezin.
D'bê jin..
Seyên Soltanî har bûyne
L' kolanên te xwînê d'rê jin.
D'bê jin..
Pîrhevî yê leşê te d'kêlin û
Cerg û hinavêt te d'gezin.
D'bê jin..
Hindî şeva Soltanî tarî d'bit
Agirê te herê geşê û
Xetîrên te j'ber na bezin.
D'bê jin..
Tu yê bûye bajêrekê gelek mezin!
Lê çewa ez
Li ber çavên dayika xo
Hindî meh û sal d'birim
Mezin dibim
Hêştâ zarokek biçûkim!
Tu jî wesa
Hindî gir û çiya d'birî
Mezin dibî
Her wextekê
Xeweka sivik her du çavên te girtin
Tu were.. serê xo dane ser dilê min!

L'zivistana... min tu d'viyay
Çaxê befrê
Hemî çiyayêt te d'hinîn.
Li buhara... min tu d'viyay
Em reveka zaroka bûyn

D
I
H
O
K

Me j' rezên te bahîv d'zîn.
Li havîna... min tu d'viyay
Ez ê serxoş
Li niv şeva
J' gelyê te d'hat bayekê hîn.
Li payîza ... min tu d'viyay
Destekê nû j' zarokên te
Berif xandîgehê d' bezîn.
Lê l' xûrbet û xerîbiya
Hemî wexta min tu d'vêy
Tu bibye gurgek û j' daristanekê bêy...
Min tu divêy.
Tu bibye taveka dijjwara gijlokê l' serê min bêy..
Min tu divêy.
Tu bibye kamkeka agirî..
L' bin her du pêt min b'zêy...
Min tu divêy.
Tu bibye kabîsek jî d'xewna min da bêy..
Her min tu d'vêy!!

D'bê jin..
Tu yê bûye bajêrekê gelek mezin!
Ji pêlên te
Reşekêt Soltanî d'bezin.
D'bê jin..
Ejdeha yê bûye Fir'ewn
Yê b'ser hinarekê d'kevît
Berê roja te wergêrît
Lê roja te her wek berê ji gelyê Bêsirê d'helêt
Û l'girêt Şaxkê ava d'bit!!!

BARKIRINA KURDAN

Bares Batê

Wek hemî milletên dinê em kurd jî xwedî hinek tiştên taybetî û çihê ne. Lê çaxê mere xwe û hinek ji van milletên di didê berhev, hingê mere gelek tiştên xerîb û ecêb dibîne. Van salên dawî kurdê me jî wek gelên di yê ji rojhilata navîn dest bi koçê kirine û bardikin diçin welatên Ewropa. Welatên Ewropî bi alkariya Emêrika rewşeke siyasî ku milletên wek me yê nexwende fehm nekin peyde kirine. Ev welatên tîr yan jî maldar û xwedî îndustrî alkariya eskerî bi rejimên van welatan re dikin, wan û çinarên wan û li aliyê din jî wan û gelên wan berahev didin, wan bihev didin kuştin. Welatên wan xerab dibê, însanên wan perşan dibin, ekonomiya wan dikeve binî û karkerên van millet û waletan di revin diçin ber destê Ewropiyan. Dibin xulamê emperyalizmê; bê dilê xwe bê zanîna x û warên xwe berbidin, jî çand û gelê xwe dîrkevin.

Erê pir raste ku kurd bêhtir ji van dormedora xwe bindestin, bê welatin bê hevalîn, bê mecalin û hezar perçe ne. Lê belê em ji hemî kesî bêhtir ber bi vê malmîratîyê ve wêraniyê direvin û di revin welatên Ewropa yê n xwînmêj. Ez bi xwe jî yêk wana me. Lê ez ji hindikayî ve alkariya kurdên nû nakim ji bo ku werin Ewropa. Em ji

nezaniya xwe ber bi van welatan de di revin. Ma gelo kîjan kurdî yan jî kîjan derketiyê li Ewropa bûye xwedî mal û milk, gelo kê zêdetirî nanê zikê xwe tişteker biser xistiye ?

Ev dewlet bi navê demokrasîyê dilê xwe bi me dişewitînin, me wek kesên siyasî qebûlî welatên xwe dikin. Bi rastî dijminatiya me bi zaneyî dikin, me ji dijminê me re çels dikin û me ji çih û warê me dîr dikin. Xortên me yê çîwan ji karxanên wan re lazîmîn, qîz û jînen me cêrtiya wan dikin û ew jî wek axayê kevneperest lê bi navê demokrasîyê xwîna me dimîjin.

Em kurdên ku niha li Ewropa dimên alkariya kesên xwe nas û pîsmamên xwe dikin jibo ku wan bînin Ewropa. Me mala xwe xerab kir û dixwazin mala wan jî xerab bikin. Li gor behweriya min ev tişt ne dostanî û alkariyê ev dijminatiyê. Gerek hemû kes û bi taybetî hemû rêxistin û partiyên kurd bi hişkî li dijî vî tiştî rawestin û koça kurda yî ber bi malmîratîyê bidin rawestandîne.

Kesên bî rastî ku di kar û barê xwe yê siyasî de aktîvin û debara wan yan mayîna wan li Kurdistan ne mumkune gerek li derve bin. Ew divê ji bela û zordestiya dijmin bêne parastin. Divê herkes alkariyê bi wan re bikê.

Lê bi rastî divê siyasî bin, divê mecala wan ya mayîne li welêt pir zor be. Heger em van her du kurd bi temamî asîmîle bibin yan jî li welatên Ewropa bine xulamê emperyalizmê û wê pûç bin ne tişteker; wek Ermenîyan, Asûriyan Suryaniyan.

Heger bi rastî em kurd bixwazin ji gelê xwe re û welatê xwe re alkariyê ji van welatên xweyî endustrî û li gor gotina wen 'DEMOKRAT' bigrin; divê em bi rîya dîplomasiyê bi wan re bidin bistênin, bikin ku ew dewlet giraniya xwe ser van dewletên ku Kurdistan parvekirine bidin diyar kirin û Kurdistan bidin azad kirin. Ji me re dibêjin ku em 'alkariya we ya însanî dikin, derketi ye we dihewênin cem xwe û we wek milletekî qebûl dikin' Lê li aliyê din ji pere û çekên giran didin van dewletên ku Kurdistan di navbera xwe de parvekirine (Tirkiye, Îran, Îrak, Suriye). Demokrasî buyê benîstê devê wan. Di bin navê demokrasîyê de me didin kuştin, welatê me didin firotin, mal û hebûna me didizin û xortên me ji xwe re dikin xulam.

Li dawî hêviya min ji hemû kurdên li Ewropa eve; Ku bala xwe baş bidin vê pîrsgirêkê û alkariya Welatê xwe û welatvaniyê xwe bi zaneyî bikin, xwe bidin ber vê malmîratîyê, vê KOÇÊ.

Ronahî ji nû ve çap bû

Gelî xwendavanan !

Di mehên borî de li Swêdê li bajare Uppsalê çapxana Jina Nû berhevoka kovara Ronahî çapkir û weşand. Hemû hêjmarên Ronahiyê di berhevoke'de hatiye çapkirin. Berhevok bi tîpên hûr 584 rûpel e. Kaxiz û çapa berhevoke gelek spehî ye. Berhevoka Ronahiyê 80 kronê Swêdê ye. Em dixwazin di derheqê kovarê û berhevoka wê de çend gotin ji nivîsara çapxana Jina Nû ya ku : Li ser kovar û Xwediyê wê nivîsandiye bigrin û bidin:

(....)

'Ronahî, kovarek mehanî bû. Di bin mavê kovarê de bi fransîzî hatiye

nivîsandin, ku 'zêdayiya (ilawa) Hawarê ya wênekirî ye.' xwedî û gerinendeyê berpîrsiyar, Mir Celadet Ali Bedir-Xan bû. Li Şamê der diçû. Ji hejmara 1.ê heta hejmara 12.an di 'Çapxana Sebata' de, ji hejmara 13.an heta hejmara 28. an jî li 'Çapxana Teraqiye' hatiye çapkirin.

'Ronahî' jî serî heta hejmara 22. an li pey hev her serê mehê derketiye. Hejmara 23 jî bo du mehan (sibat-adar 1944) de çûye. Hejmara 24 û 25 cardin jî bo mehekê derketine; lê 26 û 27 li ser hev jî bo du mehan (ji bo Hezêran Tirmeh 1944 û ji bo Tebax-Îlon 1944) derketiye. Piştî wê kovarê qasî

şêş mehan nabên daye jiyana xwe. Hejmara 28.an di Adara 1945.an de der çûye. Jê pê ve jî bi temamî rawestiyaye.

Bi rastî jî nû ve berhevkirin û çapkirina kovara 'Ronahî' karekî gelek qenc û giranbihaye. Herqîçes şandin û xwandina kovarê li welat qedexê be jî, îro li derê welat nêzîkî milyoneke kurd hene. Di nav van kurdan de jî nû ve çapkirin û belavkirina kovarê ji aliya dîrok, edebiyat û zimanê kurda, dema nêzik ve 'Ronahî' gelek dozan ronî dike. Divê 'Ronahî' wek kovarên kurd yê nû din yê nû edebî û dîrokî, di pirtûkxanên her kurdê ronakbîr û welatparêz de hebe.

DI HEFT SALAN DE BI 200
KESÎ ÊŞKENCE KIR, KUŞT, KUT
Û LENG KIR.

Li Tirkîyê û li Kurdistanê bi hatina
cunta faşîst re, bi hezaran şoreşge-
rên tirk û dîsa bi hezaran şoreşger û
welatparêzên kurd, di zîndanên cunta-
yê de êşkence dîtin, kut û leng bûn,
hatin kuştin. Ew kesên ku divayî û
gebgaziyan dîtin û ji zîndan derke-
tin der li welat û li derê welat çala
cûrên êşkencan kirin û di vê babetê
de nivîsandin. Lê hezar mixabin, ew
propagande, bes di nav çada şoreşge-
ran û di nav çarçova weşanên wan de
ma. Fireh û belav nebû! Şoreşgeran
her çîças di vê babetê êşkencê de li
Ewropa xebatek şandan jî, cuntayê û
burjuvaziyên tirk bi xebat û weşanên
xwe perde kişandin ser û heta ciye-
ki gelê Tirkîyê, Kurdistanê û Ewru-
payê xapandin jî. Pêşî lêgirtin

Lê niha li Tirkîyê, bûyereke mezin
çêbû. Ev bûyera ha, wek bombek te-
qîya. Polisekî tirk, bi navê Sedat Caner
êşkencê îtiraf kir. Caner, cara pêşî di
kovara "NOKTA" (2 Şubat 1986)
de îtirafên xwe, ji awira gelemperî-
re da diyar kirin.

Sedat Caner, bi xwe êşkencekar
bûye. 7 Salî vî karî kiriye; da ku ke-
çîkeke kurd, Cennet Degirmenci di
destê wî de miriye. Li ser vê yekê ew
bûyer êşkera bûye. Meqamên bilind û
mezin nikaribûne vê bûyera ha bintar
bikin û wek yê din weşêrin. Ji ber ku
Dewleta Tirk xwe li dij êşkence şan
bide, wek her demî, ewcar jî, polis
Sedat Caner û du hevalên wî yê din
ceza dikin. Ji vê sedemê jî, Caner di-
be mahkûm. Di vî warî de Caner, ji
"NOKTA" yê re weha dibêje:

— Tiştê ku eqilê min ne girt ev e,
ji bo êşkencekirinê me birin perper-
de kirin, alet û îmkanan ew didin, he-
ta me emrê wan tam bi cî ne aniyana
me ceza dikirin. Niha jî dibêjin 'we
çima êşkence kiriyê?' û ji vê yekê
jî ceza didin me. Eqilê min vî tiştî
nagre!

Polis Sedat Caner bi qenala "NOK-
TA" yê hemû cûr û ciyên êşkencê
êşkera kir. Me jî, ji wan cûrên êşkencê
çend fotograf girt.

Li ser vê îtiraf û daxuyaniya polis,
awira gelemperîya Tirkîyê û Kurdis-
tanê, hîn jî li dij cuntayê û Dewleta
Tirk hat guhartin. Roj bi roj rewş di
alîyê elehiya cuntayê de tê guhartin.

Ji bil "NOKTA" yê, çend rojna-
me û kovarên din jî, polis dîtin. Bu
çend roj in, ku piraniya weşanan li
ser êşkencê dinivîsîn û belgan û id-




polisê êşkencekar

ÊŞKENCÊ ÊŞKERA KIR!


DALQANDINA FILISTÎNÎ

HER DU DESTÊN GIRTÎ
LI PEY PIŞTA WÎ GIRÊ
DIDIN. WÎ/WÊ DEXDIXIN
SER KURSIYEK Û DES-
TÊN GIRTÎ DAVÊJIN
CANGALÊ. HEMÛ QU-
WETA GIRTÎ TÊ SER
MIL Û PARSUYÊ GIR-
TÎ. Û BI QABLOYAN
CERYAN DIDIN ORGA-
NÊN GIRTÎ.



POLÎSÊ ÊŞKENCEKAR — SEDAT CANER

JINAN TAZÎ DIKIN Û HER DU ÇAVÊN WAN GIRÊ DIDIN.
WAN LI SER MASÊ, SER PIŞT BI ŞIDÎ, BI MASÊ VE GI-
RÊ DIDIN. BI MOSLIXÊN AVÊN PÊT, AV LI ORGANÊ
WANÊ CÎNSÎ DIKIN, HETA KU ŞOKE BIBINI



dîan pêşkeş dikin. Serok û berpirsi-
yarên partiyên burjuvazî jî, wek ro-
viyên fenek û tirsonek hêdî hêdî po-
sê xwe ji qulikên xwe derdixin û li
dij êşkencan radiwestin. Ji van roviyan
yek jê jî Ecevit e. Ecevit heta niha li
Ewropayê helbestan dixwendin; îro
jî li dij êşkencan dipeyive. Rovî nabin
şêr.

Ev bûyer bûyereke gelek giring e.

Vekirina wê, vekirina faşizmê ye
Pêwîst e, hemû rêxistinên şoreşgerên
kurd û tirk di vê babetê de gelek ak-
tîf bin. Bûyera êşkencê, bînin sazi-
yên navnetewî. Perda ku li ser faşiz-
mê hatiye raxistin divê bêt çirandin.
Hêj bûyer teze û nû ye, divê bala awi-
ra gelemperîya Ewropayê bêt kişan-
din. Form û platformên mezin bên
çêkirin.



DEZGEHÊ QESAB

Girtî tazî û çav girêdayî ye.
Girtî bi lingan ve ser serî dal-
qînin. Ceryan didin organên wî!



Kaya 530204

kroppsliga sensationer av domningar och värk i a-
ben, yrsel, irratabilitet, mobilisering av trauma-
med ångest och känsla av kontrollförlust inför v-
situationer. Den lagrade smärtan i kroppen ökar v-
inaktivitet och "efter solens nedgång" och ökar
sömnbesvären. På ett konkretare plan korresponder-
olika påtagliga symptomen med de olika typer av
som Kaya tvingats utsätta sig för.

Lar Örfil 10/9. 85

Ev fotografa jorin ya her du lingên Zeynel Abidin Kaya ye. Û ni-
visara bi swêdî jî, di derbarê êşkence dîtinê wî de raporek e.

Zeynel Abidin, Kurdekî ji Kurdistanê Bakûr e. Wî, di zîndanên
Dewleta Tirk de êşkence û lêdanên nedîti dîtiye û xwariye. Ew
niha li Swêdê ye û tedawî dibîne. Di destê wî de, li ser êşkence dî-
tina wî bê hejmar belge, rapor û serpêhatiyên wî hene. Ew bi xwe
belge û rapora herî berçav e. Wî, ji wan serpêhatî û raporên xwe
beşek da redaksiyona me jî. Em dê di hejmarên pêş de wan çap
bikin û biweşînin.

JI KURDISTANÊ NÛÇE Û BÛYER

bombe û belavok dibarin

Cunta faşîst a kolonyalist her ku diçe li Kurdistanê Bakûr êrişên xwe yê har, hov û pir alî hîn bêtir zêde û fireh dike.

Ordiya kolonyalist û faşîst di van çend mehên dawî de giraniya xwe daye ser tixûbên Kurdistanê. Lek bi lek leşkerên xwe dişine dorhêla tixûbên Îranê, Îraqê û yê Suriyê 1040 kîlometre çargoşe "DORHELA HESAS" elan kir. Wek tê bîra xwendevanên me, me di hejmarên berê de li ser koç-barkirina gundiyan dorhêla tixûbê nivisandî bûn. Niha li gor nivîsandinên rojnameyên tirk, bi biharê re koç-barekî din dê destpêke. Ordiya dagerker berê, ji tixûbên Îranê ve destpêdike. Û her bi yê Îraqê û Suriyê ve tê. Ji bo barkirinê ji niha ve 11 gund agahdar kirine. Bi helandin û çûyîna berfê re, leşkerên tirk dê rûniştvanên van 11 gundan jî bişeynin hêla Tirkîyê. Ew gundên ku navên wan jî niha ve jî bo barkirinê diyar bûne ev in:

Menşelik, Ayrınlı, Kandil, Karasu, Yukarı Pirinççeken, ûnlüca Gemidere, Çayırılı, Sarp, Üzûmkıran û Vargelim.

JI ELMANYA TANG Û KÛÇIK JI EMERİKA DÛRBÎN TÊN

Dewlet û ordiya tirk ji bo baş kontrol kirina herçar tixûbên Kurdistanê, ji mēj ve plan û bernamayan mezin dane pêş xwe. Dewleta dagerker û ordiya wê ji bo, ji hev çûtkirina tēkiliyên her çar perçan, ji xwe jî berê ve tixûbê navbera xwe û Suriyê mayin û dînamît kirî bû. Lê, bi ser neket. Piştî 1980 yî cunta faşîst dest bi ted-



SÎNORÊ BI ELEKTRİK

CUNTA FAŞİST, BI ELEKTRİKÊ, BI ŞEVAN SÎNOR RONÎ DIKE. KES NIKARE NÊZÎ WÊ BIBE. EV JI SÎNORÊ ELEKTRİK BERGEHEKE BERÇAV E.

bûrên nû yê nûjen kir. Hejmara leşkerên tixûbê zêde kir. Qereqol, kozik û kemînen nûjen û binerdik çêkir. Dest bi kişandina elektrîk a tixûbê kir. Bi kişandina elektrîkê tixûbê seran ser ronî bû. Ev proja elektrîkê piranî bi cî hatiye. — Wek di fotografê de tê dîtin. — Proja elektrîkê ji tixûbê Derya Spî ve ber bi yê Îraqê ve diçe. Hema hema tixûbê Tirkîyê û Suriyê giş bûye elektrîk Ji aliyê din ve Dewleta Tirk, ji bo parastina tixûban, ji Elmanya Rojava tangên nûjen û kûçikên perwerde dikire Or-

diya tirk, ji bo kûçikên bînkêş û rêçger milyonan pere dide Elmanya Rojava. Wek di fotografê de jî têt dîtin, cendirmeyên tirk, li ser tixûbên Kurdistanê kûçikên perwerde yê ku ji Elmanyê kirîne, digerin. Me çend meh berê, nûçeke bi fotografê di Berbangê de weşandi bû û me li bin wê nivisandi bû, ku "Dewleta Tirk, ji bo parastina tixûbên Kurdistanê, ji Emerika Yekbûyî dûrbînên tarîtiyê dikre." Niha leşkerên dagerker li tixûbên Kurdistanê wan dûrbînên şevê bi kar tînin.

LI KURDISTANÊ BOMBE Û AYET DIBARIN

Ordiya dagerker, di pişt hewqas tedbîr, hêz û êrişên xwe de şerê psikolojîk jî didomîne. Ji bo ku tirs û lerza dewleta dagerker bixe zik û çokên gel; bi şerê fîzîkî re, şerê psikolojîk jî tûj û dijdîne. Gur dike. Rojname tirk Milliyet di roja 15.01 1986 an de di rûpele xwe ya yekemîn-de bi tîpên gir "Eşçiya Teslim bibe!" nivîsarek belav kir. Û li kêleka nivîsarê jî, jî tetbîqata hewayî fotografek weşand. — Em jî wê fotografê diweşînin. — Helikopterên leşkerî li deşt û çiyay, li ser gund û bajaran bi hezaran belavok, ayetên quranê û hedîsan davêjin. Di belavokên xwe de dibêjin ku "ey eşçiya! ji bîr neke çanûna poşmaniyê hêj jî derbas dibe. Teslîm bibe. Tu ciyê hevalên xwe şanbidî cezayê te gelek sivik dibe." uhw.. Ji derê van belavokan helikopter ayet û hedîsan jî davêjin. Yek jî wan di rojnamê de jî hat weşandin. Em orjî-nala wê çap dikin û werdigêrinin zimanê kurdî. Kurdiya wê wehaye:

"Gelî hemwelatiyan!

Binêrin dîne îslamîyê bilind jî we re çi emir dike:

'Yên ku li dij we şer dikin, hun jî di riya xwedê de li dij wan şer bikin. Xwedê kesên tecawizkar hes nake.'
(Qur'an-î Kerîm sura Bakare ayet 190)

Ordiya dagerker, dixwaze bi ayet û hedîsan Kurdên dîndar bixşîne gel xwe û wan li dij kesên welatparêz bi kar bîne. Doza netewî di bin perda dînî de veşêre. Ev jî taktîkên ordiya Osmanî ye. Mîrasê dagerkeran e.



İşte uyarıcı broşurler

LI KURDISTANÊ, HELÎKOPTER BOMBE, BELAVOK Û AYETAN DAVÊJIN.
NIVISARA JORÎNJI WAN AYETAN YEK E. HELÎKOPTER DEMA AYET Û
BELAVOKAN DAVÊJE ZAROK WAN BERHEV DIKIN.



CENDIRMÊ TIRK, LI DORHÊLA SÎNOR, KÛÇIKÊ KU JI ELMANYAYÊ
ANIYE FÊRÊ RÊÇGERÎNÊ DIKE.



CENDIRMÊ TIRK DI KEMÎNA POLA DE

ÇEND GOTIN LI SER ROMANA TU

zinarê xamo

Didawiya sala 1984 an, di nav weşanên Dengê Komal da "romanek" Mehmet Uzun, bi navê "TU" hat weşandin. Min jî wek xwendevanekî ev "romana" M. Uzun girt û xwend. Piştî ku min "romana tu" xwend, min hewce dît ku li ser çewtî, kêmasî û hîn nezaniyên di "romanê" da bîr û baweriya xwe binivîsînim.

"Romana Tu" dema meriv li ser baş bisekine û li ser her çewtî û kêmasiyan hîn bibe, ez bawer dikim ku wê pirtûkek jî "romana Tu" hîn mezintir karibe bê nivîsandin. Bi guman nivîsek wisa dirêj ne hewce ye. Lê belê hin tişt henîn ku bi kurtî bin jî ezê li ser wan bisekinim û li gor zanîna xwe van çewtî û kêmasiyan rabere xwendevanan bikim. Lê belê dibê tişteki jî serî da diyar bikim, ew rexneyên ku ezê li "romana Tu" bigrim bes wê wek rexneyên xwendevanekî bin. Ger bi hawakî din bibê jî ez, ne hunermend û ne jî rexnegirê edebiyatê me.

Bê guman dibe pirsê yekem ev be: Gelo meriv jî "romana" M. Uzun ra dikare bibêje roman, ya jî nikare bibêje? Û ya din jî, dema wek romanê bê qebûl kirin, gelo meriv di nav kîjan şaxên (tîp) romanê da dikare bi cî bike û cî navê dikare lê ke? Bê şik ev yek karê hunermend û "rexnegir" e. Lê pir mixabin hetanî niha — li gor baweriya min hîn jî wext jî ber ne çûye — tu kesî li ser vê "romana" M. Uzun tu tiştê ne nivîsandiye. Li gor baweriya min ev kêmasiyek mezin e. Dema li ser pirtûkekê, çîrokekê, meqalekê edebî, ya jî helbestekê bê nivîsandin, kêmasî û çewtî, aliyên baş û aliyên nebaş bi xwendevanan bê nivîsandin, wê him jî bo nivîskar û him jî ji bo xwendevanan baş bibe. Karekî wisa wê him fêdeyek mezin bigihîne edebiyata me û him jî wê edebiyat, pê pêş da here. Lê belê vê yekê di nav me Kurdên Kurdistanê Tirkîyê da hîn wek adetêkê cî ne girtiye. Rexne nayê kirin, lê dema bê kirin jî gelek caran gotina dawiyê tê gotin.

Ez cardin werim ser pirsê xwe gelo meriv "romana" M. Uzun dikare di nav kîjan şaxên romanê da bi cî bike? Û jê ra bibêje romanek çawa? Min li jor jî gotî bû ev kar, karê hunermend, zana û "rexnegira" ye. Lê belê li gel viya jî, wek xwendevanekî ezê jî dîtina xwe bibê jî. Bi ya min eger ku meriv "romana" M. Uzun wek romanê qebûl bike, ew romanek otobiyografîk e. Ji ber ku nivîskar di romana xwe da, qala xwe û perçekî jî jiyana xwe dike. Yanî qehremanê romanê nivîskar bi xwe ye.

ROMANA TU Û MEWZU

Bi kurtayî mewzûa "TU" jîyan û serpehatiya xortekî ye. Li navçak Kurdistanê Tirkîyê di sala 1972 an da xortekî 19 salî şevêkê tê girtin. Sebebê girtina xwe, ew bi xwe jî nizane û gelek caran vê yekê jî pirs dike. Û hetanî dawiyê jî ne nivîskar û ne jî xwendevanê yekê fêr na bin. Lê belê em tê digihîştin ku qehreman — TU — merivekî pêşverû, şoreşger û gelek jî entelektuel e. Lê meriv nikare vê ye-

kê wek sebebê girtina wî qebûl bike. Ji ber ku li Kurdistanê hemû însanên şoreşger û pêşverû ne hatine girtin û ên hatine girtin jî, ji ber hin kar û barên xwe hatine girtin. Bi kurtayî dibe jî bona girtinê sebebê berçav — heq — ne heq, ew tişteki din e — hebe. Di "romanê" da em viya nabînin.

Piştî ku "TU" — M. Uzun — tê girtin (bi wî ra çend kesên din jî hatine girtin) çend rojan li qereqola bajêr dimîne û di dû ra radikin Diyarbekrê. Lê em di "romanê" da dibînin ku di dema girtî bûnê da gelek lêdan lê tê kirin. Bes ev sehnên lêdanê (işkencê) ji gelek mezin hatiyê kirin, yanî pir lê zêde bûye.

Piştî ku dibin Diyarbekrê li wir jî pîr lê dixin. Û di dû ra davêjin zindaneke; ew tê da bi tenê ye. Di vir da kêzîkekê dibîne û radibe jî kêzîkê ra qala jîyan û biçûkaniya xwe dike. Pîrriya romanê bi axaftina bi kêzîkê ra derbas dibe. Dawiyê dikeve girtîgeha Diyarbekrê. Ji dest pêka girtina wî hetanî girtîgeha Diyarbekrê ew her hesreta zarotiya xwe û rojên borî dikîşîne.

ROMANA TU Û CIDDİYET

Bi rastî hin tiştên wisa henin ku, romana Tu bes ne jî romantîyê, her wisa jî ciddiyetê ji gelek dûr dixê. Berî her tiştî, di gotin û dîtînan nivîskar da yekîtîyak tune ye. Tiştên ku di rûpela pêşin da hati be gotin, di rûpelek din da tê inkar kirin. — Ya jî, ji bîr kirin. — Hin tiştên sedî-sed li dijî wê tê parastin. Bi gotinek din rûpelek, rûpelek din pûç dike. Ka em nuha çend mînakên ji van sosîretên giran bibînin.

Şevêkê pûlis digrin ser mala qehremanê (ji nuha û pê ve ezê car-carîna nivîskar û M. Uzun bi kar bînim. Ji ber ku navê qehreman tune ye.) "romanê" û mala wî saxî dikin. Lê ew ji berê da tişteki wisa dipê û loma jî hin tedbîr girtine. Wisa dibêje: " Tu li gor xwe bi tevdir (di vir da 'tevdîr' na be, dibe tedbîr ba) bûbûyî! Û herçî kîtap, kovar û romanên kurdî hebûn te ew jî dabûn alî" (R. 29). Bi van rêzên jêrin em tê digihîştin ku nivîskar kurdî dixwîne û gelek "kîtap, kovar û rojnamên kurdî jî li ba wî hebûne. Lê bi vê "tevdîrê" ra jî dema pûlis pirtûkên li ber destan top dike, di nav wan da helbestek kurdî bi destnivîsana nivîskar di nav da dibîne. Nivîskar dinivîsîne " li ser kaxîza sipî bi destnivîsara te, şûrekê ji bajariyê te yê gorbihîst hebû." Pûlis jî nivîskar pirs dike:

- Ev şûre, çi ye?
- Belê şûre.
- Bi çi zimani ye? Bi kurdî ye?

— Belê bi kurdî ye (r. 51). Lê di rûpela pêş da em dibînin ku întiresa nivîskar li ser edebiyata kurdî ne ev tenê bûye. Di rûpela 74 an da wisa dibêje "Tu demekê herçî zargotina kurdî bin, li ser xebitbûyî û hinek stranên şîne berhev kiri bûn. Ew hemû niha di kûpan de radizin." Bi vê mînakê jî em dibînin ku xebata nivîskar li ser zargotina kurdî jî hebûye. Lê belê di derek din da vê zanabûn û xebata xwe jî bîr dike û di girtigehê da dema Apo jê dipirse: "Rast tu dikarî bi kurdî bixwînî û binivîsînî?" ew dibêje "na ez nikarim" Em bala xwe bidin bersîva nivîskar bi xwe.

"Pirsa ku te dipa, hatibû. (...) Na Apo... nikarim, te got û domand, lê ez dê li vir fêr bibim. (r. 153-54) Belê me dît ku ew kesê di mala xwe da 'kîtap, kovar û rojnamên kurdî' li ser hev bûn û helbesta kurdî bi destnivîsa wî li mala wî hat girtin û bêf van jî li ser "zargotina kurdî" xebitî bû, "hin stranên şîne top kirir bû", anuha em fêr dibin ku ew, bi kurdî ne kare binivîse û ne jî bixwîne. Ez bawer dikim ku ev mînak bi serê xwe tenê "romana" M. Uzun jî roman bûnê gelekî dîr dixe.

Axafina M. Uzun û Apo dom dike. Lê piştî ku nivîskar dibê ez bi kurdî dizanim bixwînî û binivîsînî, îcar Apo vê daxwazê jê dike:

"Eger rojekê tu bixwazî li ser min binivîsî, divê tu bi kurdî binivîsî. Ev jî ji te re qewtîya min e. Ji ber vê yekê divê tu sozê bidî min.

— Başe Apo, soz, eger... eger ez rojekê hin tiştan li ser te binivîsînî, ev dê bi kurdî bin û paşê ez dixwazim wan wergerînim zimanên din (r. 154). Li gor ku me Apo nas-kirî bû ew jî girtiyekî sîyasî ye. Û berî M. Uzun di girtigehê da ye. Ew kalekî 73 saliyê û gelek tişt hatine serê wî. Û ew û M. Uzun berê hev û dû nasakin, ev cara du dyan e ku li ba hev rûdin. Gelo merivekî wisa wê çawa rabe jî xortekî 19 salî û tu hevaltiya wan bi hev ra tune û di ser da jî xort bi kurdî ne zanibe bixwîne û ne jî zane binivîsîne daxwazek wisa jê bike? Ya din jî xort ne nivîskar û ne jî rojnamevan e. Ma jî ber kîjan xusûsiyeten xort wê Apo vê daxwaza han jê bike? Ev jî alî Apo da, jê jî alî xort da jî qebûl kirina daxwazek wisa pirr ecêb e. Û di ser da jî soza wergerandina "hin zimanên din" jî dide Apo. Carê diyar e ku çesta bi zimanê din ne tirkî ye; ger tirkî ba wê bigota tirkî. Ji xwe "zimanên din" mana wî "çend" ziman in, bi kêmasî jî yekê bêtir e. Û bi ihtîmalek mezin wê hin zimanên Ewropayî û ya jî Swêdî be. Lê em dibînin ku wê demê nivîskar, em dev ji "hin zimanan" berdî hîn bi kurdî nizane bixwîne û binivîsîne. Gelo însanekî wisa çawa dikare soza nivîsandinê bide xelkê û him jî bi çend zimanan?

Di zîndanê da dema nivîskar bi kêzikê ra dipeyîve, dibêje ku min jî çîroka te pirr hez dikir. "Ez rastiyê bibêjim, bes jî çîroka te hez dikir. (r. 7) 'bawer bike, tu carî min ne got, ... Na... bes edî, ez jî vê çîrokê tîr bûm.'" (r. 8) Nivîskar jî kêzikê ra dibêje "min bes jî çîroka te hez dikir" lê rast na bêje kêzikê dixapîne. Di rûpela 62 an da li vê soza xwe xwedî dernakeve û îcar bi hezkirinek din dikeve hember me. Ji kêzikê ra wisa dibêje: "Min jî çîroka Memê Alan pirr hez dikir. Ew jî bo min her tişt bû." Wek me dît, berê "bes jî çîroka kêzikê hez dikir." Lê nuha jî "çîroka Memê Alan jî bona nivîskar her tişt e.

ROMAN TU Û FANTAZÎ

Nivîskar dema taswîra kela bajarê (Swêreg) xwe dike, di derekê da wisa dibêje: "Lê kela we ya qehm bextereş bû. Ji bextereşiyê û neçariya xwe digeriya. Ji hezar û nehsed û bîst û sîsyan û bi vir ve biyaniyan bandera ala xwe daçikandibûn ser bircên wê. Ala wê daketibû. Biyaniyan ala

xwe hildabûn şîne. (r. 20) Bi van gotinên jorîn meriv tê dighîşe ku hetanî sala 1923 an navça nivîskar (Swêreg) serbixwe bûye û alek wê ya biserbixwe jî hebûye. Lê pişt sala 1923 Tirkan ala wê daxistine û di dewsa wê da ala xwe (ala tirka) daçikandine. Em hemû dizanin, ku ala kurda berî 1923 an jî li ser keleha Swêregê li ba ne dibû. Û Tirk jî ne di piştî sala 1923 an hatin, ew berî 1923 an jî li Swêregê bûn û Swêreg cardin di bin destê wan da bû. Li vir, dikare bê gotin ku roman ne dîrok e û loma jî nivîskarê romanê jî ne mecbûr e ku wek dîroknasekî xwe bi dîrokê ve girêde. Ev rast e; roman ne dîrok e. Lê belê divê ev jî neyê jî bîr kirin, ku "roman dîrokek, ku jî dîrokê hîn rastir e." Ji ber vê yekê jî, her çiqas nivîskarê romanê ne mecbûrê ku wek dîroknasekî xwe bi dîrokê ve girêbide; lê li aliyê din heqê wî tune ye ku dîrokê serobinî hev bike. Lê belê jî bo M. Uzun tu gelsêk wisa tune ye û ew li gor dilê xwe dinivîsîne.

Pûlis malê saxî dikin û pirtûkên ku hene top dikin. Nivîskar vê sahnê wisa tîne ziman: "Pihêr rûpel diqeliband û pişt re kîtap datanî ser masê. Rebenên Rilke, Conrad, Coysse, Tolostoy, Dikem, Marn, Kavawis, Lawrence, Falknar, Gary, Hayyam, Derwiş, Wafî û yên din ketibûn destê konûsêr." (r. 49) Yanî xortekî 19 salî, li Swêregê di sala 1972 an da van nivîskaran dixwîne! Eviya tabloyek ne rast e, fantazî ye. Lê em dom bikin. "Komiser jî tişteki re hêrs bûbû. Kitabeka di destên wî de bû, kitêb vekiribû, li rûpelekê dinihêrî. Û hem jî serê xwe dihejand.

— Yanî niha ev jî şîr e? Hal û karê van, tiştên wisan nivîsandine. Hele binhêre.

Dest pê kir xwend (r. 49) Di vir da komisêr jî Lorca şîrekê dixwîne. Lê xweş na xwîne. Ji ber vê yekê jî nivîskar gelekî aciz dibe û dibêje:

"Xwedê ev çî xwendin bû! Dilê te teng dibû. Mîrze komisêr, piştî 36 salan qetilkirina Lorca, ew careke din di şeveke tarî û şilî ya Kurdistanê de, li oda te qetîl dikir. (...) Ew bêjên xweşik yê Lorca di devê mîze komsêr da dibûn kelem, dibûn kozên êgêr bi canê te diketin." (r. 49) Nivîskar (wê demê 19 salî ye) hewçasî jî helbestan fam dike, ku xwendina çewt ya Lorca "dibe kozê êgêr û bi canê wî dikeve." Carê berî her tiştî xwendina "komisêr" a Larca bi meriv tabî naye, hinekî anormal e. Ji ber ku, di wê taftafê da "komisêr" helbestê naxwîne û nakeve raberizandinê. Lê em bibêjin xwend Gelo çima Lorca? Her xuyaye, ku nivîskar dixwaze nişan bide ku wî, wê demê Lorca dixwend û loma jî Lorca bi "komisêr" dide xwendin.

Meriv li gor şertên Kurdistanê û pêşveçûna gelemperî û civakiya wê demê nikare bawer bike ku li Swêregê xortekî 19 salî "Rebenên Rilke, Conrad, Coysse, Tolstoy (Tolstoy me qebûl kir), Dikem, Mann, Kavawis, Lawrence, Faulkner, Gary Heyyam, Derwiş Wodî û Lorca" xwendibe û karibe bixwîne. Di nav van nivîskaran da tişteki gelek bala meriv dikşîne, ew jî ev e, ku hemû nivîskarên bîyanî ne û hemûyên wan jî, ji mezinên edebiyata cihanê tîne hesibandin. Lê belê nivîskar di derek din da vê zanabûn û entelektueliya jî bîr dike û wek însanekî gelek nezan derdikeve hember me. Ezê nuha di vî warî da mînakek gelek întresant bidim.

Di girtigehê da nivîskar bi "xocêkî" tirk ra dipeyîve. Xocê Tirk di axaftina xwe da gotina "perspektîv" û "mesajê" bi kar tîne. Lê xwendevanê wan nivîskarên bi nav û deng tişteki jî gotina "perspektîv" û "mesajê" fam nake û dibêje, "te jî gotina perspektîv û mesajê tu tişt fam ne kiribûn. Te jê (ji xocê Z. X.) pirsî." (r. 158) Gelo çawa dibe ku însanekî ku girre-girrên nivîskar û helbestvanên cihanê bixwîne, li hember çewtxwendina Lorca "kozên êgêr"

bi canî wî keve û anuha jî rabe bibêje welle ez jî gotina "perspektîv û mesajê" fam na kim? Yan jî ew merivê ku hin jî gotina "perspektîv û mesajê" fam neke, wê çawa karibe efrandinên van nivîskarên cîhanê yê bi nav û deng bixwîne? Ma gelo ev yek, ne wek reş û sipî, şev û rojê li dij hev in?

Nivîskar van gotinên jêrîn jî bo "komisêr" (yanî qum-sêr Z. X.) dide gotin.

— Ha ev Çexov heye, ev Çexov, van Rusya ser û binê hev kirin, nîzama bolşevik anin Rûsyayê. Namûs û şerefa xelkê pay û mal kirin (çesta nivîskar paymal e. Z. X.) Ev zîlam hevalê serokê sor Lenîn bû. Çima lawê te (jî dayika nivîskar ra dibêje) van pirtûkan dixwîne? (r.50) Çi tesedûfîyek mezin bûye ku "mîrze komisêrê" nivîskar jî merivekî gelekî "entelektuel" bûye. Ji ber ku ew Çexov nas dike û li ser wî û Lorca bi nivîskar ra dikeve munaqesê. Di esasê xwe da nivîskar bi minaka Çexov xwestiye ku "Mîrza Komisêr" gelekî nezan û cahîl şan bide. Li hember wan gotinên "komisêr" nivîskar pîr hêrs dibe û wisa dibêje: " Mîrza komisêr de bes e! Ev çend jî nabe, tu ne mec-bûnî, ku jî bo her tiştêkî bipeyîvî, baweriya xwe bibêje. Çexov li ku, Lenîn li ku, jî ku ew bûn hevalên hev. (r.50) Ne rastiya vê sahnê bira bimîne li alîkî û ezê li ser vê yekê jî ne sekînim. Lê ezê li ser gotina " Çexov li ku, Lenîn li ku" bi kurtayî çend gotinan bibêjim. Meriv jî gotina " Çexov li ku, Lenîn li ku" wisa fam dike ku tu dibêjî çey di navbera Çexov û Lenîn da 3-4 sed sal hebûne û loma jî nivîskar bi "komisêr" da hêrs dibe, dibêje " Çexov li ku Lenîn li ku." Yanî hewqas jî hev dîr in. Lê ya rastî di navbera Çexov û Lenîn da bi sedan sal tuneye, her du jî di demekî da jiyane. Çexov di nabera salên 1860-1904 da jiyaye; Lenîn jî di nabêna salên 1870- 1924 an da. Yanî çaxa Çexov mîriye Lenîn 34 saliyê û salek din wê li Rusyayê şoreşe 1905 an çê bibe.. Eviya jî aliyê demê da wisa. Lê jî aliyê bîr û baweriyê jî Çexov, ne li dij sosyalizmê ye. Û heta di salên xwe ên dawî da gelekî nêzikayî nîşanî bîr û baweriyên sosyalist da. Wek tê zanîn dema Gorkî wek endamê rûmetkar jî akademiya zanistîra hat hilbijartin. Çar ev biryar qebûl ne kir. Wê demê jî Çexov, jî bona protesto kirina vê biryara Çar rabû jî endametiya akademiya istîfa kir. De îcar meriv tê nagihîje gelo çima nivîskar jî " Mîrza Komisêr" ra dibêje, " Çexov li ku, Lenîn li ku."

Me hetanî vira dît ku nivîskar çiqas merivekî zana, pêş verû û hunermend e. Û li aliyê din jî, cardin me dît ku ew, çiqasî mîr û jêhatiye, ku me dît jî "komisêr" ra got çî û çawa lê rabû. Lê cardin ev nivîskar, dema "komisêr" dest bi saxî kirina malê dike, wê karibe van gotinên jêrîn jî, jî diya xwe re bibêje: " Dayê metirsîn, ne xerîb in, mîrze komisêr û hevalên wî ne." (r. 45) Îcar jî bo selametiya me hemûyan mîrze komisêr û hevalên wî dixwazin li der û dora malê jî bigerin. (r.46) Nivîskar li vira ne yê berê ye, ew bi diya xwe ra wek însanekî napeyîve. Ew wek doste- teke dewletê, wek hevalekî " mîrze komisêr" dipeyîve, jî diya xwe ra dibêje: " ne xerîb in mîrze komisêr û hevalên wî ne" jî wê cumlê wisa tê fam kirin mîna ku "komisêr" heval û dostê nivîskar e û loma jî nivîskar "mîrze komisêr" xerîb na hesibîne, wek însanekî jî malê dihesibîne û jî ber vê yekê jî, jî diya xwe ra dibêje " ev ne xerîb in." Ni- mîrze komisêr û hevalên wî ne" jî wê wisa tê fam kirin, mîna ku "komisêr" heval û dostê nivîskar e û loma jî nivîskar "mîrze komisêr" xerîb nabîne, wek însanekî jî malê bihesibîne û jî ber vê yekê jî, jî diya xwe re dibêje, " ew ne xerîb in." Nivîskar wisa didomîne: " jî bo selametiya me hemûyanne. Em jî divê jî karê wan ra alîkar bin."

Lê em dizanin ku hatina "mîrza komisêr" û saxîkirina malê jî bo selametiya hemûyanne. Lê pîr mixabin nivîskar wê bû- yerê wisa dibîne û loma jî jî diya xwe daxwaziya alî- kariya wan dike. Nuha jî em bala xwe bidine dema pûlis nivîskar dibin diya wî çî dibê û çawa dike:

" Lawê min, bira xwedê bi te re be. Tu rûyê me reş, tova (tovê Z. X.) me bê kes ne hêlî, jî bir neke, te şîrê diya xwe jî bo van rojan mêt, metirse, metin be, got... Qeda bi we û bavê we keve.

" Dengê diya te bû. Tu vegeryayî û te lê nihêrî. Ew jî derketibû ber derî û herçend şîre-şîra baranê bû jî, wê avê di satilê ku di destan de bû, li pey te direşand; te (tu Z. X.) bi rê dikir."

Li vira diya nivîskar wek însaneka milîtan û şoreşger der- dikeve hember me. Gelo di rewşek wisa da, ku pûlis û beqçî şev nivê şevê tije hundir malê bûne van gotinên diya nivîs- kar çuqasî rast rast in? Lê tiştêkî herî ecêbtir jî, mesela rijandina avê ye. Em giş dizanin av li pey rêwiya, li pey heciya û ên herin leşkeriyê tê rijandin. Îcar nivîskarê me ne heci ye û ne jî dihere leşkeriyê, ew girtiye û dibin qere- çolê. Ma gelo di rewşek wiha da wê diya nivîskar çawa rabe avê li pê lawê xwe birjîne? Û hem jî şev nivê şevê û jî şevan jî şevêk bi baran! Nivîskar jî bona bi diya xwe jî hin tiştan bide kirin û wê jî hinekî derxe pêş, radibe van anormaliyên bi diya xwe ve didde kirin. Lê di rastiya da ne mumkun e ku diya nivîskar van çewtiyan bike.

Têkilîyên nivîskar û diya wî jî pîr entresant in; ne wek têkilîyên Kurda ye, wek têkilîyên du aristokratên Ewru- payiya ye. Ezê nuha du minak jî wan têkilîyan bidim.

" Tu li malê bûyî. Piştî kelîkê, tu hatibûyî oda xwe, de- riyê oda te lê da. Tu têgehîştibûyî; diya te di sa hedîsên wê di destan de , li der te diçû, dihat ku te bigre. Carek din deriyê te lê da." (r. 24-25)

"Carna jî, dema şevên tu li mal bûyî, bi hêdîkanve dihat, li deriyê te dixist û dipirsî;

— Çavreş min, tu dixwazî ez bêm, jî te re çend hedî- sên cenabê pêxember bixwînim. (r. 23)

Meriv çaxa van rêzên jorîn dixwîne, meriv berf na xwa- ze jî çawên xwe bawer bike. Û di dî ar jî ev pîrs tê bîra meriv, gelo însanek çawa dikare jî rastiya civaka xwe hewqasî dîr keve û hewqas tiştên ne rast binivîsîne? Wer xuyaye ku nivîskar M. Uzun jî xwe ra têkilîyek wisa aris- tokratîk xeyal kiriye, lê di rastiya civaka me da tû dê (çî dewlemend û çî jî feqîr) bi destûr (bi îzîn) nakeve oda lawê xwe. Û jî xwe balbata nivîskar û van têkilîyên wî û diya wî du tabloyên ku li dijî hev in. Ji ber ku bavê qehreman (M. Uzun) merivekî canbaz e (pez dikire û dif- roş e) û du bilûrên wî hene, jî nivîskar ra yek caran li bi- lûrê dixê. Ma gelo lawê malek wisa wê çawa diya wî berê li derî xe, jê destûrê bigre û di dî ra tê keve hundir? Yek dikare bibêje ku li gundên Qerecaxê însan bi kêr û çetalan germiya dew dixwin û min jî pê xwariye. Gotinek wisa çî- çasî rast be, ew herdu minakên jorîn jî hewqasî rast in.

Meriv di romana Mehmet Uzun da dibîne ku nivîskar ge- lekî hez dike ku, xwe bi nivîskarên û şexsiyetên gelek me- zin ra birewîsîne û çala navên wan bike. Loma jî ew, girtina xwe wisa tefsîr dike. " Rebenên Dostoyewskî, Hemingway, Nerûda, Sartre, Larca Arif û yê din jî pîr serpêhati- yên wisan tahl didîtibû." (r. 54)

ROMANA TU Û OKJEKTÎVÎ

Pûlis M. Uzun jî malê dibin qereçolê. Lê qereçola pûlisan pîrekek jî girtiye. M. Uzun pê hay dibe ku pîrek di ber xwe da distirê, yanî jî xwe ra dinuhurine. Ew vê sahnê jî wisa

dinivîsîne:

" Ji rîتما wî dengî tu tēgehiştibûyî, ku jînik stranên şîne dibê. (r. 74)

" Dema hun ji ber wê (prekê. Z. X.) derbas dibûn, te birêveçûna xwe piçekî giran kir. Te dixwest dengê wê baştir sehbikî. Te diviya bû, ku tu ji dengê wê nas bikî. Dengê wê zirav, zar û zelal bû. Giran giran dinewêrî (wer xuyaye ku nivîskar ji vê gotina ' ninehwirî' pîrr hez kiriye û loma ji sê caran li pey hev bi kar aniye. Lê ne " dinehwirîye", rastiya wê dinuhuriye. Kok nuhurandine) te niha baştir dibihîst.

Xerîbî ne tû kar e.

Xerîbên helkê hemû ji xerîbiyên hatine.

Xerîbên me, dixerîbiyê de dibînin.

Wekî kulekê n pey kerîyan in. (r. 77)

" Tu, bi awayê li hawîrdar deng û olanveduna vî dengê zîz û zelal û sersem bûbûyî. (r. 78)

Meriv dibêje qey jînik ji xwe ra li Orecedaxê li ser zîna-rekî Kêlê rûniştîye, destê xwe kiriye belqa guhê xwe û ji xwe ra bi keyfa dilê xwe taw kiriye — distirê —. Him jî dengê wê, alan (yanî olan. Bi tirkî yankî, yankılanma) ve dide. Lê belê cî ne Orecedax e; li Swêregê li qereçola pûlîsa ye. Gelo li qereçolek pûlîsê Tirkîyê bûyerek wisa çawa dikare bibe? Û jînek Kurd çawa dikare wisa bistirê? Û dema bike jî (ku ne normal e) pûlîs çawa jê ra çavên xwe digrin?

Piştî qereçolê nivîskar dibin mehkemê. Di mehkemê da nivîskar wisa difikire:

" Hakim li te ne dinehêrî. Li kaxêzên li ber xwe dinêhêrî Bîskek wisa bê deng derbas bû. Paşê hakim bi cangirani serê xwe ji kaxizan rakir, li te nihêrî. Di gel ku we hevdu dinasî, tu tişt negot. Silav jî ne da. (r. 91) Bi rastî tişteki gelek entresante ku nivîskar di mehkemê da ji hakim silavê dipê û cardin ji gazinan dike ku çima wî (hakim) li hal û demê nivîskar ne pirsîye. Ma gelo daxwaza wa ne bê mantixî ye! Her kes dizane ku yekî (ew kes dixwaze ira serokwezîr be, ya jî bavê hakim be) derkeve ber mahkemê hakim çiçasî wî nas dike bira bike, lê cardin jî li hal û demê wî napirse; silavê lê nake, îfada wî digre. Hakim û kesê îfada wî tē girtin dixwaze bira lawê bavê hev bin jî, lê ev proses dîsa waye. Bê guman di vir da pîrsek din jî tē bîra meriv, gelo ewê karibe çi hevaliyek di nabêna hakim û xortekî 19 salî da hebe? Û em dibînin ku hakim, ji alî bîr û baweriyê da jî ne însanek pêşverû ye. Mînakên wisa " romana" M. Uzun hem dixwe rewşek pîrr ne baş û him jî heta dawiyê xwendevanê wê jî dijar dike.

Mînakek din jî. " Ji tû kesên din jî wisan pîrr tiştên taybetî û xas ne pirsî bûn." (r. 82) Di " romanê" da em nabînin ku tu pirsên " taybetî û xas" jî nivîskar hatiye pîrs kirin. Lê belê nivîskar jî bona ku ciyekî giring bide xwe û xwe hîn derxe pêş van gotinên jêrîn — Bej ku bizani be jî kê çî hatiye pîrsîn — dibêje. Ew yek jî rûmeta rastîniya "romanê" gelekî kêm dike.

ROMAN TU Û HIN NEZANIYÊN BIÇÛK

Nivîskar di zîndana Diyarbekirê da jî kēzê ra çala jiya na xwe ya li gund dike, dibêje: " Dema bēnderan di destpêka havînê da bû. Hûn her kes zar û zêç, pîr û kal diçûn ser zeviyan. We zevî diçandin; genim, ceh, garis, nîsk û nok cihê cihê li erdê, li cihekî paçî radixistin. Ji wan çûçan çêdikirin." (r. 12) Ez bawer dikim ku yekî bi çavê nivîskariyê li xwe mēzeke û rabe " romana" binivîsîne, dibê nezaniyên hewçasî mezin jî neke. Ma gelo di " destpêka havînê" da çawa genim, garis, nîsk, nok û ceh tēn candin?

Ger ez ne şaş bim di " destpêka havînê" da " genim, garis, nîsk, nok û ceh" naye çandin (!), lê jê hinekên wan tēn çînin. Ev aliyekî meselê ye Lê li aliyê din nivîskar, hîn jî hîn tiştên din jî bê haye. Mesela, ew hîn nizane nîsk, nok û genim tû carî bi hev ra ne tēn çandin û ne jî tēn çînin. Nîsk bi kēmasî mehekî merê genima tē çînin. Ji ber ku nîsk berî geniman diseride. Lê nok, sê-çar mehan (di destpêka buharê da) di pê geniman ra tē çandin û cardin gelekî di pê nîsk, ceh û geniman ra, di orta havînê da tē çînin. Yanî genim, ceh, nîsk û nok bi hev ra nayên çînin.

Mînakek din: " Di esasê xwe da, navbera we û baranê, bervê (bervê çî ye min fam ne kir) xweş bû. Hewças bê aman, hewças xedar ne bûn heberê we di şevên çilê aman, hewças xedar ne bûn hemberê we. Di şevên çîksayî yên zivistanê de, baranê xwe delal xwe berdidan jêr. (r.11) Ez bawer dikim ku di demên "çîksayîyan" da baran na bare, baran, di demên ewr da dibare. Dema dinya " çîksayî" be, li aşîmanan sitêrk yek bi yek tēn jimartin û dinya xweş e, baran nabare. Mînakek jî li ser zîpikê: " Zîpikên wisa mezin û golover li ser bajêr dibarandin, ku tu kesî nikaribû gavên xwe bavêje der. (r. 12) Bi vê cumlê meriv wisa tē digihije ku, tu dibê qey hinek çûnin aşîmana û jî wir bi ser bajêr da "zîpikên wisan mezin û golover" dibarînin.

Nivîskar carî jî jî kēzê ra çala gund dike, jiyan û biçûkaniya xwe wisa tîne ziman: " Berî cîh û cîgeha hevûdu dîtina keçên xama û xortêngihayî jî bû. Keç li wir nêzikî qehremanê xwe dibûn. Dilê xortan li wir bi agirê evina bērîvanan di-

kizirî. Ji nav şeqên bizinanve, ji paş dūvên miyan ve li hev dinêhêrin, ji hev re (yanî bi hev re Z. X.) dibişirin. (r.174) Carê bidin heşên xwe, keç û xortan, hinekan mîhî û hinekan jî bizin dane ber xwe û gişan jî serên xwe na xistine nav nigên mîhî û bizinan û bi gotina M. Uzun " ji van şeqên bizinan, ji paş dūvên miyan ve li hev dinêhêrin, ji hev re dibişirin" wê diyîna vê sahnê çî manzarak entresant be! Ma aqil heye fikir heye, wê çawa xort keç herin serên xwe na tēkin nav "şeqên" pez û bi hev re bibişirin, ma çima cî ne ma? Carê berî her tiştî însanên hinkî hiş di serî da hebe naçe wa nake. Lê belê ya din jî, ji alî bûniyê da tişteki wa ne mumkun e. Yek, dema bēriyê du kerî nayên cem hev û bērîvanên du kerîyan nikarin li ba hev, li nêzî hev bēriyê bikin. Dudu, di dema bēriyê da di nabêna du kerîyan da bi kēmasî 10-15 deqçe mesafe dibe. Ji bo ku piştî bēriyê kerî (pez) ne gihî hev; tev hev ne bin. Dema li kêleka hev bērî bikin wê pezê tev hev bibe û veçetandina du kerîyan jî mirina reş e. Loma jî tu carî du mal li nêzî hev bēriya nakin. E de îcar wê çawa xort û qîz serên xwe na tēkin " nav şeqên bizinan û paş dūvên miyan" û " ji hev re bibişirin" ?

Nivîskar jî kēzê ra dom dike. " Dema jin û mēr karên xwe dikirin; didotin serdana pez dikirin, ew diferkandin (piştî bēriyê serdana pez na be, mana " serdanê" saxî kirine. Ferkizandin jî tune ye, dibe ku nivîskar ev gotin çewt bi kar ani be.) distiran jî. Bi dehan stranên bēriyê hebûn. (r. 174) Nivîskar dibê " bi dehan stranên bēriyê hebûn", lê ne rast e, stranên ku bi bēriyê ra tēn gotinê tune ne. Ji ber ku bērî û stran bi hev ra na be. Em dizanin ku li bēriyê hinek hillêbî ne, hinek ser bērî ne û hinek jî bērî dikin. Û ev hersê serî jî bi pez ra herbê dikin. Pez bi hêsani bēr na be, na yê ser bēriyê, tim vir da û wê da baz dide. Yekcarna wisa dibe ku nivîskar bera mîhekê, bizînekê didin. Û hetanî berî diqêde gelek caran gewrî li bērîvanan zuha dibe. Loma jî şertê meriv tune ye ku li ber bēriyê bisitirê. Bala meriv her li pez û bēriyê ye. Yekî ku li ber bēriyê bisitirê milletê bi goma bi serê wî/wê keve.

Lê belê sitranên li ser bêriyê, li ser bêrivanan, li ser şivan henin, ev tişteki din e. Yanî sitranên ku li ser bêriyê hati bin gotin, ew nayê wê manê ku bi bêriyê ra tén gotin.

M. Uzun nivîsandiye dibêje, " Dema di dana (danê Z. X.) sibê de şivan kerî dibirin çêrê, berx û kar jê hev vediqetandin. Mîh û bizin çihê, berx û kar çihê diçûn çêrê..." (r. 173) Nivîskar bi çî nizanî bû ye lê rabûye xwe li wiya rakşandiye. Ma cara kesî diye ku "dana sibê" kar û berx ji pez veqetin? Ji ber ku êvarî tevê nabe, ku sibê jî jê bê veqetandin. Û ya din jî dibê nivîskar bizanibiya ku pez hin dinya tarî ye (hîn saet- du saet şev heye) ji mexel tê kişandin; bê guman ew jî dema ku pez ne şevder be wisaye. Ma gelo di wê şeva tarî da merivê çawa kari be kar û berxan ji makên wan veqetîne? Bê şik ne wa ye û ji xwe tu kes jî wisa nake. Bi rastî eger ku nivîskar li gung jiya bû, ya jî baş pirs kiri ba, wê bizaniba ku piştî bêriya êvarê û dan kirina kar û berxan pez dihere çêrê û kar û berxan jî tînin malê dixin kozan. Ew hetanî sibê, roj bejnêkê du bejna hiltê di kozê da ne û di rû ra zarok wan dibin çêrê. Û pez jî dema were ser malê ya fêzê ye û ya jî dixin hefso. Û pirrê cara şivan jî di nav da radikeve. Sibê jî hîn dinya tarî ye pezê xwe dikşîne. Ev yek wisa dom dike hetanî pez sitewr bibe.

Mînakek din jî: " Dema kerî dixuya, min baz dida, ez diçûm ba wan û li gel şivanan diketim gund û min bi wan re distîra" (r. 174) Li vir jî nivîskar sitranekê jî mînak dide, "Gundo bêrî bêrî... ' Carê berî her tişyî şivan ji bo çî pezên xwe tînin nav gund? Lê em bibêjin di gundê nivîskar şivanan pezên xwe danîn nav gund, wê demê jî mesela sitranan ne rast e. Ji ber ku şivan ji pezê xwe ra li fitikê dixê, li bilûrê dixê, lê jê ra nasitirê. Loma jî pîrrianiya şivanan bilûrvan in. Û dema didin pêşiya pezên xwe ya hin dangan derdixin, ban pez dikin, li fitikê dixin û yan jî li bullûrê dixin, lê nasitirin.

Li gund kirîbê nivîskar karekî dide wî. Ew ji karê xwe gelekî hez dike û pê ra demên gelek xweş derbas dike. Wisa dibêje: " Di nava daran de û li ser xîç, xilik, kevir û girên çiyayî de wekî mûyekî difitilî. (r. 172) Lê belê marifetên kêr ne ev tenê ne, hîn hene. " Êdî çiya daristan, gol û kaniyên hawirdor ji me re teng dihatin." (172) Nivîskar çaxa van rêzên jorîn nivîsandiye ew qet li ser ne fikiriye ku ew her were qala karekî dike. Lê nivîskar qal kirina xwe hewqasî jî rastiyê dîr xistiye ku tu dibê qey ev ne karekî biçûk e, hebe-tunebe helîkopter e. Ji ber ku " çiya, daristan, gol,, kanî, xîç, xilik, kevir û girên çiyayî" jê ra teng tê, di nav wan da " wek mûyekî difitilî." Him jî di nav gol û kaniyan da jî!

Em hemû dizanin li gund adet e, dema zayina pez her zarokê ji xwe ra kar û berxekî digrin. Mezin ji wan re dibêjin ev "kar", ev "berxa" ê te ye. Bi vê yekê kêfa dilê zarokan xweş dibe. Lê belê kar û berxan wek topekê na din destên zarokan, wan ji kar û berxan vediqetandin. Lê nivîskar jê veqetîne, dide ber xwe dihere çiya, daristana, gol û kaniyan digerrîne û di dî ra jî li kêr dixwîne şev dike meriv tîngîhîje, lê bi hêsanî tîne malê.

Nivîskar di rûpela 33 an de jî kêzê ra wisa dibêje. " Bi şimika xwe ya gelavdûnê, li vir, li ba kekê xwe bimîne." Lê ev çewt e, ne bi şimika xwe ya gelavdûnê ye rastî, bi şahra xwe ya gelavdûnê ye.

Mînakek dawîn . " Barake (bereqe, wek qulûba ji texta) ji du maxan pêkhatin. Deriyê maxa din girtibû, ji lewre jî te ne dikar. bû tu (cumlak çuqas ne xweş û çewt Z. X.) wê maxê bibînî. Maxa ku tu tê de bûyî biçûk bû. (r. 108) Nivîskar li vir max, di dewsa " hucre, oda biçûk, xaniyê biçûk" da bi kar aniyê. Lê tiştê ku ez dizanim max, ew

darên (beşt, stûn, tîr jî tê gotin) ku meriv davêje ser xaniyan ji wan ra tê gotin. Mesela dibêjin konekî li ser heft stûna - heft stûnî- bû, lê odek li ser 24 maxan bû. Yanî dema yek bixwaze dirêjayîya oda yekî fêr bibe, dibêje, " oda te li ser çend maxa " ye? Lê nivîskar "max" kiriyê "ode" û ew bi xwe jî ketiyê hundirê wê.

ROMANA TU Û TASWIR

Nivîskar di girtigehê da bi Apo ra rûniştîye û hin hereketên wî wisa taswîr dike: " Ew (Apo) hêdî hêdî dibişirî. Bi tilîyên xwe yên beran û şikefalîs ve bi qedeha ber xwe dilîst. (r. 143) " libên tîsbîhê yek bi yek dixistin nav tilîyên xwe yên beran (r. 143) Ma gelo hetanî îro li rûyê erdê tu beranê ku tilîyên wî hebin hatiye dîtin, ku tilîyên "Apo" jî wek ê beranan bin? Ez bawer dikim ku tilîyên berana tune ne, ku ê însanan jî wek wan bin. Meriv meroq dike, gelo tilîyên beranan çawanin ku M. Uzun rabûye tilîyên "Apo" jî bi yên wan taswîr kiriyê? Ger ez ne şa bim beran simên wan (nigên) wan hene, tu beranên bi dest û bi tilî tunene.

Ev jî taswîra daran: " Her celeb, her texlit dar hebûn. Darên bi ber, darên bê ber, zirav, qalind, dirêj, kin, qayim û kevnar her babet hebûn." (r. 166) Rast e, darên zirav, qalind, dirêj û kin' henin lê darên bi ber (yanî bi tirkî enli Z. X.) û "bêber" (yanî ensiz) tune ne û meriv tu carî jî daran ra na bêje darek bi 'ber' bû ya jî "bêber" bû. Lê dara bi "ber" û bê 'ber' di mana ku dara fêkî didde, ya na de tê bi kar anîn.

RONAMA TU Û ÇEND ÇEWTIYÊN BIÇÛK YÊN GRA-MATİK

Di "romana Tu" da tişteki din bala meriv dikşîne, ku ew jî qelstiya nivîskar ya zimên e. Di rûpela 173 an da nivîskar wisa dinivîsîne: "Dema roj dibû sor (yanî sor dibû (Z. X.) û dilekî bi agir û di nav qelşa torina Feratê de, (Feratê de) yanî di newêl de ava diçû û ji me xatir dixwest." Lê em giş dizanin ku roj "ava naçe", diçe ava. Çewtiyên nêr û mê û yên wextê ji gelek in; ne mumkun e ez li ser gişan bişekinim. Bes ezê çend minakan li jêr bidim.

ÇEWTE

RAST

Tu mêvanê minî (r.8)

Tu mêvana min î

Misîna destmêjê (r. 15)

Misînê desmêjê

Piştî tav du-sê buhust radibû, roj heldihat (r.20)

Tav û roj yek, dema tav derdikeve roj jî hilahiye.

Wan we dikirin dizek û keleşên zebeşê (r. 26)

Wan hûn dikirin dizek û keleşên zebeşan.

Li xweşa te neçûbû (r.28)

Bi Tirkî ye.

Zahmete singê min diêşe Te çûyî û te derî vekir (r.14)

Zahmete singa min dişe. Tu çûyî û te derî vekir.

Biborin lê rast, hûn kî ne? (r. 42)

Biborin, lê rast hûn kîne?

Kitab bi dîl girtibûn

Kitab dîl girtibûn.

Wê jî hiriya xwe bi teşiyê xweş dirêsand (r. 58)

We jî hiriya xwe biteşiyê xweş dirist.

HEVPEYVÎNEK

REWŞA KURDAN LI SWÊDÊ

—Di vê rewşa xirab de, ma gelo Swêd weke dewlet, vataniyê xwe baş tîne çih?

—Lars Gunnar: Ji hêla maddî (alika-riya multeciyan li çihane û alfkariya welatên belangaz) de, Swêd vatiniyê xwe bi çih tîne, lê belê ev ne bês e. Ji aliyê din xebata ji bo heq û hukukê merov, xebata ji bo demokrasî, xebata alfkariya ji bo gelên bindest ûhw. Swêd ji gelek welatan baştir kardike, lê merov dikare xebata xwe di vî warî de xurtir bike.

Wek ku tu ji pê dizanî problemên Kurdan li Swêdê gelek cara hatine munaqaşakirin. Di vî warî de semîner hatine çêkirin pirtûk hatine nivîsandin. Gelo problemên Kurdan li Swêdê çava tê analîzkirin, muşqala giring ji bo kurdan li Swêdê çi ye? nêrina invandarverket çi ye?

— Problema yekemîn yekîtiya komelên Kurdane. Perçebûneke gelek zêde di nav Kurdên Swêd de heye. Federasyona Komelên Kurdistanê piraniya Kurdên Swêd li gel xwe komnekirîye. Ez hevidar im ku rêxistina we ya komunnan bi serkeve. Divê kurd programeke gelek berbiçav (konkret) ji bo xebata Swêd çêkin. Di civata Swêd da, bê rêxistinî merov çiqas baş, aktif be jî kar baş nameşe. Problem, di nav grubê din yê biyanî da jî hene, lê belê cana merov nikare du(2) kesê kurd, li ser maseyeke bi-

civîne.

Divê merov karibe problemên politik û ideolojîk hinek ji hev çihê bike û bi taybetî li Ewropa. Gelek problemên kurda li Swêdê hene, wekî ziman û agahdarî, fêrbûna xwendin û nivîsandinê, kesên ku asak(iskwnce) ditîne, rewşa jinên kurd ûhw. Ew problemên hemû rexistinên siyasî, komelên demokratîk, divê merov li wan problema bi awayekî realist mêzeke

Ez hêvîdikim ku komelên me kurdan guhbidin dostekî xwe û hinek encam ji wan dîtînan derxînin. Di xebata xwe ya siyasî de hemû rexistin azadin, lê belê di xebata li Ewropa gelek problemên me şirikatî hene. Em kurd bi hev ra dikarin van îmkânên Ewropa tar û mar nekin, hemû rîya bi karbinin û dost ê gelê xwe pîrbikin 'ez ezî' bi kêre kesî jî naye.

Ev çand sal e bi Lars-Gunnar wekê karmendekî bi kurdan re xebat dike. Min ji Lars-Gunnar pîrskir, tu wekî dostekî gelê kurd dikarî dîtînen xwe li ser kurdan bigîştî jî me re bês e? Daxwazin te çi ne di vî wêrî de?

—Bi rastî kurd grubekî pir aktif in. Li hejmara komelan, kovaran, hunermendan, şevên çandî, weşanên pirtûka uhw binêrin. Kurd xwedî baverî û însiyatîf in, lê pir cara xebat wan bi avê de diçe. Divê Kurd karibin îmkânên xwe yê maddî û menavayî (kad-ro) li hev kombikin, da ku karibin xebatê baştir bikin!

Min ji kurdan wusa zêde xebat ne dipa.n. Sebebê ku ez wan tiştan dibejim ne ewe ku ez bi yekî kurd rerûniştîme û sohbet dikim.Ez bi derewan westê kesî nadim, ew baveriya min e. Kurd hergav dixwazin hevkarîyê bikin û zêde ne bi şûphe ne.Hûrmetkar û sipaskar in. Lê perçebûna wan li Swêdê problemekê gelek negatîf e. Ez baver im ku kurd karibin bi yek zimanî bipeyive, ewê bêtir karibin alîkarî jî dewleta Swêdê bigrin. Heger hun xwedî dîtîn û peşneyarên berbiçavbin, hun dikarin alîkarî jî bo xebata merovanî (humanîter) jî bo Kurdistanê jî bigrin. Swêd bi gelek welatên bindest re alikariya projên diderbdreyên ziraatê, xwendin û nivîsandinê, nexweşî di vî warî de gavan bavêjin. Li Swêdê hun dikarin rewşa kurdan raxin berçavan. Li Botkyrka, Tensta, Rinkeby rewşa kurdan hinek zelal bû, jî ber ku li wan komunnan hinek xebateke lêkolînî çebûn. Merov dikare li hemû Swêdê lêkolînen wusa çêke, da ku rewşa kurdan bi giştî berbiçav bibe. Ji bo wê merov dikare projan çêke û alîkarî bigre. Ez hêvîdikim ku di van mesela de pêşniyar jî Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê bêt.

Piştî ku hevpeyina me tewa bû, Lars hinekî bê deng ma. Çavên vî çûn derekî dûr. Ez baver im li Kurdistanê bû, di nav pêşmergan de bû. Pêşmergan pîroz dikirin!

ÇEND GOTIN LI SER ROMANA TU

Ka çawa bavê xwe biner-minim (r. 62)

Tolikan (r. 63)

Te nedikaribû ku tu bipe-yîvî (r. 70)

Vecinçiya (r. 70)

Te, rûyê te ber bi diwêr, dambûn rûniştin (r. 71)

Kê bûn ew (r. 71)

Rast rebenê diya te... (r71)

Ew kê bû, yê li kêlekê kê bû? (R. 74)

Tu bi wê dengî giran û zelal (r. 77)

Kesên gilyên min dike kê ye? (r. 91)

Kurdiya modern e, di kurdi-ya eşîran da hemberya wê tune.

Tutukan

Tu nikan bû bipeyivya

Veciniqî

.....!

Ew kî bûn?

Rast rebena diya te.....

Ew kî bû, yê li kêlekê kî bû?

Tu bi wî dengê giran û zelal Kesên gilyê min dikin kî nin?

Kesên gilyê min dikin kî nin?

Kê çi dizane.....

Hûn bi xwe rahîştin tiştan. (r. 111)

Hê wextê te hebû (r 116)

Ka tu kî yî (116)

Tu rûpela yekemîn quliband. (r. 134)

Kena ser rû... (r. 144)

Ew ji saet 8 an re 5 bimine ji derî xuya bû (r. 148)

Ez bawer dikim ku van minakên jorin bes in. Ez hetanî vê derê li ser hin kêmasî û çewtîyên 'romana' M. Uzun sekinim û min li ser wan bîr û bawerîya xwe got

Wek tê zanîn edebiyat, bi ziman tê kirin û ziman jî wek qelbê netewakî ye. Mîna ku carê hevalekî jî min ra gotî bû merivekî nezan dikare li ser serê yekî fêrî berberîyê bibe lê mafê wî tune ye ku li ser sistema şîrîrê (ya jî qelbê) însanekî fêrî cerahiyê (bijûşkiyê) bibe. Û ez bawer dikim dema bixwaze bibe jî, netîca bijûşkiya wî jî eşkere ye: Kuştina nexweş.

Kî çi dizane.....

We bi xwe rahîşt tiştan.

Hîn wexta te hebû.

Ka tu kî yî

Te rûpela yekemîn qulipand.

Kenê ser rû...

Saet ji 8 an re 5 mabû ew ji derî xuya bû.

FERHENGOKA BERBANGÊ

<p>A</p> <p>Arsimî : Serma girtî</p> <p>B</p> <p>Bayê hîn : Bayê sar li havînê Befîr : Berf Bizûtnewe : Bizav, hereket</p> <p>C</p> <p>Cerg : Ciger</p> <p>E</p> <p>Emîş : Ew jî</p>	<p>G</p> <p>Gelyê Bêsirê : Li rojhilat Dihokê Gijlok : Teyrok Guhandir : Serê guhanan</p> <p>H</p> <p>Hinav : Hundirê merov Hindî : Çiqas Hênane kayewe : Peydakirin</p> <p>K</p> <p>Karmen : Memûr Kasax : Jar Kolan : Kuçe</p> <p>L</p> <p>Le pê nawî : Ji bo</p>	<p>P</p> <p>Pîrhevî : Pîra cado</p> <p>Q</p> <p>Qerax : Kenar</p> <p>R</p> <p>Reşek : Merovê amîr Rev : Ref</p> <p>Ş</p> <p>Şaxkê : Devreke ji Dihokê</p> <p>X</p> <p>Xetîr : Beysos Xo : Xwe</p>
--	---	--

PÊKENÎNEK AN PÊGIRÎNEK

dên Stembolê çi dixwazî?

— Ma ez çi bêjim, bavo, bavo!... Hun nîv milyon hatine vira ji bo kar bikin û razin. Ji bêy vê yekê tû derdê we tune. Stembol xweş û jiyana wê ji gelek hêja ye!

— Na lo hewqas jî kevir li me ne xe. em jî li gor xwe hinek kar û xebat dikin. Lê dibe ku kêr û jar be! Xebata bingehin li ser milê we ye. Li ser axa xwe dibe, ne li vir, li bîyanîstanê.

— Na, na bi xwedê hun tiştêkî nakin. Li min binêr, nîv milyon kurd li vir in, na? Nîv milyon..... Hun nîv milyon kurdên Stembolê bi serê xwe û bi tenê karin di demeke gelek kurt de Dewleta Tirk ji binî ve xira bikin û hilweşînin. Çima tu dikenî? mekene!

— Na, ez nakenim, guhdariya te dikim. Fermo, dom bike!

Kurdê welatparêz di cî de rawesta û li der dora xwe nihêrî, ku yek tune; bi dengê gelek nizim:

— Binêre, nîv milyon kes, her êvar her kes 5 kevir bike berîka xwe û...

— Pênc çî?

— Pênc kevir, kevir!

— Eyyy!

— Eyy, eyy!. Her kes 5 kevirên xwe, bike berîka xwe û derkeve der. Here dora van xanî û dikanên mezin û dewlemend, her kevirê xwe li camê bixwe û bişkinê! Şevê çend cam tê şikandin?

— Du milyon û nîv.

— Ev bûyera ha, mehek seranser dom bike, çend cam tê şikandin û li gor wê jî di salê de çiqas dike? Ka de hesabên wê çêke?

Kurdê Stembolê, eniya xwe diçiqrand û dest bi jimarê dikir:

— 75 Milyon perçe cam dike.

— Perça cam çend lrayê tirk e?

Kurdê Stembolê, ji cî hilkişiya û bi lez bi rê ket:

— De were looo! Dev ji van çirokan berde!

— Wele wele ji te re şerm e! Ez çîrok mûrokan nabêjim; Ciddî dipeyvîm. Rast e ger hun bibin Stembolî, dê gotinên min jî, ji we re wek çirokan bîn.

"Gotinadev ji van çirokan berde!" lê ne hat û gelek hêrs bû. Hevalî wî dît ku ew gotina wî li xwe girt, ber pê

çû destê xwe avêt milê wî:

— Ez ji te gelek tîka dikim, tu gotina min çewt fam nekî; mebesta min ew bûn ku tu bi min henekan dikî.

— Heval em meselê ciddî dipeyvin. Wexta min û çirokan nîn e. Ji xwe me ji her tiştî re got çiroke; ji ber vê yekê jî, em li pey xelkê man. Na, na em di bin lingên xelkê de man.

Hevalê wî yê Stembolî dixwest dilê wî ragre û ji ber vê yekê jî dest bi lavan û fûrtan kir:

— Bibore me hev çewt fam kir. Ka fermo de bêje, mesela xwe ya caman biqedîne?

— Li gor dîtina te cam şikestin bûyereke gelek biçûk e!...

— Na, na bawer bike ne wesa ye. Perçek cam ji 2000 î destpêdike he-tanî 10.000 î.

— Tu ji xwe re dibînî, ev bûyera cam şikestinê salek-du sal dom bike; tu dizanî dê çi bibe? Bi xwedê dê ekonomiya Tirkiyê îflas bike, na? Û ew çax Dewleta Tirk xwe bi xwe belav dibe!...

Her du gehîştin ba qeraxê derya Stembolê. Ketin nav qelebalixê. Deng ji wan dihatin birîn!

DESTÊN TARI

Jêhat Diyar

Hiv ne çû bû ava, lê belê şev bi nêvî bû bû. Ji ber ku hivron bû, her du peyayên şevê nêzî guhera pez di taldê de rûniştûbûn û li hêviya raketina şivanan dipan. Her du peya, di karê xwe de şit bû bûn; kî dizane ku ev şeva çenda ye, bi vî awayî li derve, şevder dimînin, li bendî "nêçî-ra" xwe bê pêjin dipên. Gava kulekek dikuxiya yan jî kalîna berxekê dihat, her du şevgeran bînen xwe bêtir diçikandin, guhdarî dikirin û bi hostayî li hev dinêrin. Tiştên ku dixwestin ji hev ra bibêjin, bi awiran tê digihîştin.

Lê belê her du ne camêran ne li kalîna berx û mîhan guhdarî dikirin, guhên wan, hiş û balên wan li şerê her du şivanan bûn, ku ji êvarê de çirik û gewrî li hev çetandî bûn, ji bo ku berxa yekî, mîha êdî dimije.

Şerê her du şivanan bi devekî heta derengî şevê hê jî dom dikir. Xwediyê berxê bi lava û berger dixwaze, xwediyê mîhê hinekî nerm bike, lê bîhna wî jî êdî teng bûye.

— Erê law, ma ezê rebena berxê çawa girê bidim. Heywana kerr û lal peyvê jî fam na ke ku ez jê re bibêjim. Ka emê her du dida guhdarî wan bikin, hela bê xwediyê çawa dike. Ber xwe, ne kar e ku ez wê bizmik bikim. Hew tu tiştêkî din ji dest bin na ye.

Şivanê xwediyê mîhê ji xwe bêtir bonteng bûye û bi wê hêrsê dibêje:

— Serê hezar peyvî, peyvek e! Mîha rebennewçên wê gihîştine hev, bi xwedê ku vê carê ez bibînim berxa te dîsa ketiye bin û dimije, ezê wê serjê bikim. A va ye min got!

Xwediyê berxê gawa van gotinan bihîst da dilê wî, lê vegerand.

— Kero!.. eger te tiştêkî wiha kir, bila ez lawê te bim ku ez ji te re bihêlim. Bes e êdî!...

— E, emê hevdu bibînin!

— Emê hevdu bibînin!...

Bi van gotinan şivana şerê xwe yê bi devkî qut kirin. U her yekî di nav pezên xwe de kulavên xwe li xwe pêçan kerr bûn û dahatin. Lê ji nû ve her du şevgerên şevê çirçirîn, di ciyê xwe de guhdarî xebardanan tevî kirî bûn; bi kurte-pistî ji hev re gotin:

— Ev diziya îşev ji mer ne lazim e, me navê.

— Baş e me navê, çiçasi av şolî bibe, ji me re xêr e.

Yek ji dizan ma pişmêrî û yê di daket neqebê. bêpejin nêzîkî kerîyan bû, bînekê rawestiya, ku berx here ber mîhê. Ji ber ku van awana gelek dîtûbûn, dema xwe her wiha baş nas dikirin....

Ji dût ve dengên çurçurkan car caran bê dengiya şevê diqelaşt, çend kulekên arsimî û kasax yek denga dikuxuyan. Hivê êdî nema kari bû ku xwe li her şevreşê bigre, li ber ava bû; her du şivan di vê şeva gulanê de zû di xew ve çû bûn.

Lê "xewa kuştîya tê û a birçiyana naye" her wiha berxê serê xwe rakir, kaliya, mîhê ji bersiv dayê, deng lê vege-rand. Her du heval bi gelek hisretê mak û bermakî, bi gelek evîniyên ne dihatin ser ziman, ber bi hev hatin. Berxê devê xwe xiste guhana, çiçik guhertin. Duvkê xwe hejand û bi berxîmî guhandir vala kir. Kela dilê xwe rijand. Kela dilê mîhê jî sar bû, di cî de mexel hat û dest bi kayika xwe kir. Berxê jî li tenişt mîhê serê xwe danî ser kêleka xwe bi

zîkê têr zû di xew re çû. Wê gavê ê diz di ser rebena berxê re rawestiya. Û dest bi karê xwe kir. Dest xiste çirika wê û pê li stûyê wê kir, kêra xwe ya avdayî zû bi kar anî.

Berxwedana berxê di destên diz de têrê nekir ku benden-giya şevê bide alîkî. Rebenê çend car perpitî, lê nikarî bû xwe ji destên di van awa de şitbûyî derine, rizgar bike. Di cî de hêdî hêdî sar bû.

"Şevger" xwe zû gihand hevalê xwe û bi dût ketin. Şeva tarî, şop û nîşanên wan veşart, starî li gunehên wan kir.

Her du şivan jî bi tirs raza bûn, lê xwediyê berxê beriya şivanê din şiyar bû. Guhdarî kir. Deng ji berxa wî naye. Lê bi guman ket ku, dîsa berxa wî ya nazenîn çûye ber mîha hevalê wî — Berxik êdî mîjo bû bû nema dikari bû pê, ra lê ne dibû. — rabû ser xwe, lezand, got "belkî beriya şivanê dî ji xew ra ne be, ez xwe bigihînim berxa xwe da ku tu nexweşî çênebe." Gava gihîste rexê keriyê din, berxa xwe di ber mîhê de zû dît; lê deng jê na ye, ku destê xwe avête berxê, kizîna jî dilê wî hat wekî kî mirov perçak bezê spî bavêje ser sêleke sor. Bi lez lê vege-rî. Erê! Erê!... Berxa wi ya delal serjê bûye.

Dinya li ser serê şivan hate xwar; ber çavên wî reşve-hatin, gurizî girte canê wî û mûyên wî bûne şûjn. Dilê wî wek dahola çar gopal lédida. Xweziya xwe çend caran daqurtand, lê devê wî tal û zuha bû bû. Bi wê kerbê berik da bev tifinga xwe û ber bi şivanê din ve lezand.

Rebenê xwediyê mîhê hê jî di xew de bû, gava "hevalê wî" tifing da ser serê wî û nigê wê kişand; bi gurmîniya tifengê re mejiyê wî û çapaxa serê wî ji hev belav bû. Lê hê jî kela dilê xwediyê berxê sar ne bû bû. Zingîniya tifengê di guhên wî û hênkaya şevê de heta dereng pêl dida....

..... Û bi vî awayî dijminahiyeke nû di navbera malbatên her du şivanan de destpêkir. Weke gelek nexweşiyên heyî. Îro, nizanîm ji bo heyfîlanîna çendan berek, malbatêk li pey heyfa xwe ye ku ji bera din yekî ku av lê germ bibe, bikuje.....

DILDAR

Her çende be zeqî çarey meselekani ne kirduwe. Ca îre da pirsyarêk ser hel deda aye şa'îr çî nûsiwe? Şa'îr şî'rî nûsiwe, şî'rîş derman nîye û şa'îrîş dîktor nîye.

Zimani em dût şî're zimanêkî sakare û sade ye, zimani zorbey zorî gele. Şa'îrî rasteqîreş ew şa'îreye ke zorbey xwendewaran be lay xoy da ra dekêşî û hest û raz û niya-zîyan têda be di deken we be zimani halî xoyan dezanin. Lem ruwewe Nazim Hikmet delê:

"Hunermendiy gel debê pêş hemû şitê gel têy biga û berastî hunermendiy rasteqîrey gelekey bêt "

PERAWEZAKANÎ

1 — Gîwî Mukiryani, dîwana Dildar, çapxana Kurdistan Hewlêr, 1971-1 58

2 — Heman Sere çawey pêşû p. 66

(3-4-5-6 aynî berhem, p 66-59,58,72)

ADRESS/NAVNIŞAN:

RISSNELEDEN 55 NB

172 44 SJNDBYBERG/SWEDEN

BIHAR

Ez di nav giya de,
Mêş û kulîkên rengîn.
Ez çûkeke firî dibînim.
Oyyy! çiqas xweş.
Berf hemû heliya û çû.
Bihar weha ne kin e.
Ev bihara wisa rengîn,
Ez bêriya wê dikim.
Her çih kesk û şîn,
Oxxx! ev çî xweş bîn.

